# Nivîsên Berîya Hilbijartinê

Rojda Alagyaz

Digel hemû qedexe, tûndî û zehmetîyên cur bi cur kovara Çirûska Şoreşger dike ku 3 mehan carekî derkeve. Lê mixabin carna ev navbera hinekî dirêjtir jî dibe. Û mixabin rojeva Kurdistanê jî gelekî zû diguhere û her carî bûyereke xerabtir û girîngtir diqewime. Em vê hejmarê de dikin ku derheqa gelek mijarên vê axirîyê de qewimîne fikr û ramanên xwe parve bikin.

**Divê HDP Rast Bê Fêmkirin…**

Di roja HDP hat avakirin pê ve ew hat sûcdarkirin, rexnekirin û bi aliyê hin kesan ve hîç nehat qebulkirin. HDP ji bona ku ne Kurdistanî bû hate sûcdarkirin û rexnekirin. Hate gotin ku HDP felîta Kurdan ji doza rizgariya Kurdan dûr xist û kire xizmeta demokratîkkirina dewleta Tirkan.
Xeletiyeke mezin e ku HDP ji bo van sedeman bê sûcdarkirin û rexnekirin. Lewra HDPê partiyeke wisa ye ku ji sêrî de çi gotibe ew aniye cih. Di Serî de heya niha li gorî armanca xwe ya avakirinê tev geriyaye. HDP hê di sêrî de gotibû "Em partiya Kurdan nîn in. Belê nav me de Kurd jî henin lê em partiya Kurdan nîn in. Em çiqasî partiya Kurda bin ew qasî jî partiya Tirkan, Lazan û Çerkezan in. Em alîgirtiya yekitiya xaka Tirkiyê nin, em dijberî avakirina dewleta Kurdan in. Em partiyeke Tirkiyê nin û alîgirê Tirkiyeyîbûnê nin." A herî girîng jî ew e ku gotin: "BDP partiyeka di bin bandora nijadperestiya Kurdan de bû lewma ji dewsa wê HDP hate birêxistinkirin." Lê gelo di navbera van raveyên HDPê û kiryarên wê de hîç nakokî heye? Na! Partiyê pêşiyê de gotiye ku "Em ne partiya Kurdan in" ka gelo niha mafê me heye ku em bi darê zorê wê bi wekî partiya Kurdan îlan bikin û paşê ji bixwezin ku HDP bi awayekî Kurdistanî tevbigere? Li gorî vê rewşê pir normal e ku hevserokekî HDPyî "bi eslê xwe Tirk" be. Madem "HDP partiya Kurdan nîn e, partiya gelan e" divê hevserokê wê jî li gorî vê yekê

bê hilbijartin. HDP alîgirê Kurdan, karkeran, hemzayendan, transan, feqîr û yekser hemû nasnameyên bindest e. HDP xwedîyê rabirdûyeke Kurdistanî ye û bi rastî bingeha wê ji nifûsê Kurd pêk tê, lewma jî şêwegirtina partiyê ya siyasî û sosyolojîk rê nade ku bi awayekî din tevbigere lewma jî HDP wekî partiyeke Tirkiyeyî mafên Kurdan yên "demokratîk" (ne mafên siyasî) derdixe li pêş, diparêz e. HDP partiyeke Kurd nîn e û partiyeke sosyalîst jî nîn e, jixwe dij-kapîtalîst nîn e. Dive HDP wekî partiya li Almanyayê ya çepgir (Die Linke) bê fêmkirin. HDP partiyeke wekî par-

tiyên çepgir yên li Europayê ye ku ew partî dibên ku bila kapîtalîzm feqir û bindestan jî biparêze. Ji bona van sedeman jî divê HDP ne bê sûcdarkirin û rexnekirin ne jî şermezarkirin. Heke em sûcdaran bigerin divê em pêşiyê li wan hizbên xwe li ser têkoşîna li dijberî kapîtalîzmê ve rave dikin, dixwazin ku kapîtalîzmê li holê ra kin lê diçin tevli partiyeke dike ku sîstemê temîr bike dibin. Heke em sûcdaran bigerin divê em pêşiyê li wanên Kurdistanî difirkirin lê tevli HDPê dibin, ji bona HDPê raya me dixwazin binêrin. Sûcdar ew in ku Kurdan tevli HDPê dikin, HDPê bi wekî hêviya rizgariya Kurdan nîşan didin. HDP wekî partiyeke dike ku li Tirkiyê pergaleke li gorî esasen Kopenhagê bê lidarxistin. Jixwe hêmanên di peymana Dolmabaxçeyê de cih girtîbûn jî li gorî esasen Kopehagê hatibûn diyarkirin.
Meriv dikare HDPê bes bi sedemekî ve rexne bike, ev jî ew e ku HDP xwediyê siyaseteke bê muxatab e. Partiyeke ji rastiyan dûr, nekamil e. Wekî mînak li cihekî nifûsê wê ji sedî 95 (beyî Kurdan) piştgiriya polîtikaya dewletê ya şêr dike lê HDP qala "avakirina aştiyê" dike. Li cihekî nifûsê wê ji sedî 95 (beyî Kurdan) dibê ku "em Tirk in, Laz in, Pomak in lê dawiyê de em hemû neteweya Tirk in" HDP dibê ku "em ê welatekî her kes dikare bi nasnameya xwe ve bijî ava bikin".
HDP her tim qala "gelan" dike lê bi rastî xêncî Kurdan çu kes piştgirîyê nade HDPê. HDP qala azadkirin û rizgarkirina civakeke ku Kurd dorpêçkirine û her tim amade ne Kurdan tune bikin dike. Heya gotinên HDPê yên ji rastiyên civakê dûr êdî hatine rêjeyeke wisa ku hevserokê heyî Sezaî Temellî di kongreya dawîn de got "em ê bibin hikumet." Heke em ê HDPê rexne an jî şermezar bikin divê em bes ji bona ku xeyalên vik û vala tijî li serê mirovan dike wê sûcdar, rexne û şermezar bikin.

### "Welatê Hevpar"

Siyaseta Kurdan van 19 salên dawîn pê ve dest bi gotina têgiheke nû kir; "Welatê Hevpar." Ev gotina pêşiyê bi aliyê Ocalan ve hatibû bi kar anîn. (Wê demê Ocalan di nameyeke xwe ya bona dewletê re şandibû de têgihîna xwe ya derheqa "welatê hevpar" de rave kiribû.) Heman têgiha Ocalan 19 salin di derheqê de xeber dide di kongreya HDPê a li Stenbolê de cardin hatibû daxuyandin. Selahattin Demîrtaş jî heman têgih di kongreya HDPê ya sala 2016'an de cardin ji bona gel rave kiribû.
Raveya Demîrtaş wiha bû:
"Hevparî çi ye? Heke welatê me hevpar be ev yek tê wê wateyê ku her yek ji me tevkariya vê jiyanê dike. Heke Kurd bibêjin welatê azad, parçeyê Kurdistanê yî mezintirîn di nav van sînoran de ye. Lewma Kurd dibêjin welatê hevpar." Bi rastî ev rabêja ji Imparatorî Osmanîyan û ji Kemalîstan hatiye girtin. Ev rabêjeke mêtinkaran e. Jixwe di zimanê mêtinkaran de navê dagirkeriyê an "feth" an jî "daxilkirina xaka welêt" e. Heya duh Kurdistan wekî "xaka di bin dagirkeriyê de" dihate bi navkirin lê êdî pênaseya wan ev e; "xaka bi daxwaza xwe tevli Tirkiyê bûye."Dema ku Ocalan hate girtin û ew kirin zindana Imraliyê, wî gotinen wisa kirin ku mirazê gelek kesan ji berda ma, hin kesan jî ew wekî "xaîn û tirsonek" îlan kirin. Wê demê me wiha gotibû: wan ên bûyera Ocalan bi "xaîntî û tirsonekîyê" ve şirove dikin bi awayekî siyasî nafikirin. Ev bûyera karê "xaîntî û tirsonekiyê" nîn e. Divê Ocalan bona ku berxwe neda neyê sûcdarkirin lê divê bona ku wî aliyên dîrokî û îdeolojîk ve rûxandineke ev qasî mezin li ser Kurdan çê kir, bê sûcdarkirin. A ku cardin nayê rast kirin û rûxîner ev e. Ji ber ku armanca bi Ocalan ve dixwazin ew e ku îdeolojîya fermî a Tirkan ku ev îdeolojîya di pêvajoya şêr de gelekî zirar dîtibû, cardin bihêz bikin û Kurdbûnê tesfiye bikin. A ku Ocalan dike ev e. Jixwe wisa jî bû. Ocalan di van 19 salên dawîn de Kurdbûn pê de pê de tasfiye kir û ji dewsa şiara "Kurdistana serbixwe" şîareke nû bicih kirin: "Tirkîyeyîbûn." Dibe ku gelê Kurd bi awayê leşkeri ve têk biçe, bê kuştin lê her têçûn dibe sedema serhildaneke nû. Ji kerema xwe vegerin hemû dîroka Kurdan binêrin, ev yek her wiha bûye. A cihê wê nayê dagirtin, cardan nayê çêkirin tesfiyekirina Kurbûnê ye. Gotina Ocalan û raveyên Demîrtaş ên kongreya HDP'ê de lewma girîng in.

### Gelo Kurd hemwaletiyên Tirkan/ Tirkîyê nin?

Kurd endamên neteweyeke mêtingeh in, Tirk jî endamên neteweya mêtinkar in. Lewma jî Kurd ne hemwelatiyên Tirkan in ne jî welatîyên dewleta Tirkan in. Jixwe navbera welatîbûn û hemwelatîbûnê de cudahi heye. Heya ku Kur-

dan ev yek bi daxwaza xwe hilnebijartine, bi darê zorê wekî welatî hatine qeydkirin. Bersîvên pirsa dibê ku gelo çima dewleta mêtinkar û neteweya mêtinkar dixwaze Kurdan wekî hemwelatî qebul dike, diyar e. Mabesta wan ew e ku li ser Kurdan destkariyê bikin, nehêlin ku hişmendiya dij-mêtinkar û tevgera dij-mêtinkar xwe birêxistin bike. Lê gelo dema kesekî Kurdistanî xwe wekî hemwelatiyê Komara Tirkan û neteweya Tirk pênase dike, divê em çi fêm bikin? Bo nimûne Selahattin Demîrtaş xwe wekî "hemwelatî/yurttaş" binav dike, lê wateya vê yekê çi ye? Herî kêm sed sale ku dijmin dike ku kirasê "hemwelatiyê" bi darê zorê Kurdan bide xwekirin lê veca mirovekî Kurd bi dil û can vî kirasî xwe dike û derdikeve li mederê. Gelo sedema vê yekê dibe ku bes kêmbûna hişmendiya dîrokî be? Bêguman wisa nîn e! Di salên 90î de hemû Kurdan de hişmendiya neteweyî hebû û her kesî dizanibû ku Kurd neteweyeke mêtingeh e, gelo ev hişmendiya hema şev û rojekî de çawa winda bû. Yanê xuyaye ku di Selahattin Demîrtaş û rêveberiya HDPê de jî ji vê hişmendiyê bêpar nemaye. Lê çawa dibe ku ew Demîrtaş wekî "hemwelatî/yurttaş" pêşkêş dikin. Lê gelo çawa dibe ku Kurd digel hemû zilmê û zordariya dewleta mêtinkar, bi hezaran kuştîyan, şewitandina gundan dîsa jî hemwelatîtiya Tirkan red dikirin lê niha Demîrtaş bi dil û can xwe wekî "hemwelatiyê" dewletê pênase dike? Piştî ev şerê sed salî divê Kurdan de hişmendiyeke wisa çê bibûya ku gava Demîrtaş xwe wekî "hemwelatî/yurttaş" pênase dikir û dibû namzetiya xwe bona serokkomariya dewleta Tirkan daydina, divê Kurdan Demîrtaş wekî "rezîl" binav bikira. Lê gelo çawa dibe ku Kurd li meydana şînê, cejnan pîroz dikin? Belê di şêr de têkçûn xerab e lê dîsa jî tê telafîkirin, meriv dikare ji bermayîyên şerekî têkçûyî jî serhildaneke nû birêxistin bike lê mixabin îro rewşa Kurdan wiha nîn e. A ku têk diçe şer nîn e, hebûna Kurdan xwe ye. Yanê hemû nirx û hêmanên neteweyekî pêktînîn; xîret, helwesta dij-mêtinkar, Kurdbûn ji dest diçe. Ew bes maskeyekî ku dijmin jê hez bike nakin li rûyê xwe, Kurdbûnê wekî maskeyekî li ser çêrmê xwe dipêçin lê giyanê dijmin xwe dikin. A herî xerab jî ew e ku ev yek bi aliyê Kurdan ve wekî serkeftin tê dîtin. Navê vê yekê têkçûn nîn e, înkar e û hîç çareserîya vê yekê nîn e. Xuyaye ku hindik maye ew sozê di sala 1999'an de bi aliyê Ocalan ve hatibû dayin bê girtin.

## Sendroma Stockholmê û Çend Gotin…

Wekî tê zanîn di derûnşikariyê de nexweşiyeke wekî sendroma Stockholmê tê binav kirin heye. Ev nexweşiya bi aliyê derûnşikar Bejerot ve tê dîtin û dîroka nexweşiyê digihêje bûyereke ku di sala 1973'yan de li paytexta Swedê qewimîbû. Kesek bona şêlankariyê dikeve bankayekî û xebatkareka jin a bankayê dîl digire. Ev xebatkara 6 rojan di destê şêlanker de dîl dimîne û ev jina bi awayekî dil û can xwe di bin bandora şêlankar de hest dike. Dema ku serbest tê berdan şêlanker diparêze û dev ji destgirtiyê xwe berdide û li bendê dimîne ku şêlanker ji hepsê derkeve û wê re bizewice. Jixwe dawiyê de jî ew bi şêlanker re dizewice. Pêvajoya ku Sendroma Stockholmê pêk tê bi aliyê Herman ve wiha tê ravekirin: "Armanca sereke ê tundîyê dike ew e ku qurbanîyê xwe bike dîl. Vê armanca xwe jî bi kontrolkirina jiyana qurbanî ve bicih tîne. Lê belê, stûxwariya dîl gelek caran têra kesê tundiyê dike nake: ew dixwaze ku sûcên xwe wekî mafdarî bide qebulkirin lewma jî hewceya wî ji pejirandina kesê dîlgirtî jî heye. Lewma jî dixwaze ku kesê qurbanî rêza wî/wê bigire, heya ji wî/wê hez bike. Armanca êrîşkar a bingehîn ew e ku kesê/a dîlgirtî bi awayekî dilî xwe wekî dîl bibîne." Gelo sedema van gotinên me çi ye? Bi rastî rewşa me ya heyî herî zêde vê yekê tîne ji bîra me lewma ev gotinan hatin kirin. Belê, rewşa Kurdan a heyî hema ev e. Helbet em nizanin gelo dahatûyê de navê vê sendroma Kurdan çawa daynin lê em ji yek tiştî bawer in ku rewşa Kurdan dê wekî "sendrom" an jî "trawma" bê pênasekirin. Tevahiya dîroka mirovahiyê de nimûneyeke din tune ye ku neteweyeke mêtingehkirî (Kurd) bi neteweya mêtinkar (Tirk) re têkiliyeke wiha daynin. Ev têkilî dijberî xeysetê dîyalektîk a mêtingehtiyê ye. Bo nimûne hîç serdemeke dîrokê ya din de nehatiye dîtin ku neteweya mêtingeh ji neteweya mêtinkar re bibêje "bira." Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e dîtin ku ewledên neteweya mêtingeh xwe wekî hemwelatîyê (Demirtaş Yurttaş/Demîrtaş Hemwelatî" dewleta mêtinkar pênase bikin. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e ku neteweya mêtingeh bike ku bona nakokîyên dewleta mêtinkar çareserîyan peyda bike, bona pêşxistina dewleta mêtinkar tev bigerin. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e

ku serokê neteweya mêtingeh (Ocalan) bibêje ez heyranê serokê neteweya mêtinkar (Atatirk) im. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e ku partiya ku neteweya mêtingeh wekî "partiya xwe" dibîne namzetiya xwe bona serokkomariya dewleta mêtinkar dayne û ev namzêt jî bibêje ku; ez son dixwim, ez ê dewleta mêtinkar "pêşde" bibim. Û neteweya mêtingeh jî vê yekê bi kelecan çep bike. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e ku daxwaza avakirina dewleta serbixwe bi aliyê serokê neteweya mêtingeh ve wekî "paşverûtî" bê binav kirin. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê nîn e ku endamên neteweya mêtingeh xwe bi xweş xeberdana zimanê mêtinkaran ve şanaz hest bikin û vê şanaziyê rave bikin. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê nîn e ku ewledên neteweya mêtingeh bona ku bibin mamosteyê dewleta mêtinkar rikeberîya hevdu bikin û gava bi aliyê dewleta mêtinkar ve wekî mamoste/karmend hatin pejirandin jî xwe şanaz hest bikin. Hîç serdemeke din a tevahiya dîrokê de nîn e ku gava dewleta mêtinkar ji mamosteyên xwe re dibêje terka welatê mêtingeh bikin û ew jî li gorî fermana dewleta xwe tev diğerin neteweya mêtingeh wan wekî "nankorr" binav bike.

Heke hemû ev bûyerana li erdnigariyeke din, li qadên neteweyeke din a mêtingeh biqewimîya niha wê neteweyê kesên dibin sedema van kerasetan ji zû ve tûka xwe de xeniqandibûn. Lê belê ev bûyer ji nav civaka me de dibin sedema şanazîyê, kesên vê kerasetê rexne dikin jî dûcarî lînçê tên. Helbet rojekî ev bûyere bi awayekî rast û durîst bên nirxandin û dîroke van rojan jî binvîse. Dibe ku diroke êdî Kurdan ne wekî neteweyekî lê wekî nimûneyeke vê sendromê binvîse.

## Û Tirkbûne Kurdên Xwe Afirandin…

Bona ku desthilatdariyek xwe kokdar û bibandorkar bike divê bindestên xwe jî li gorî berjewendî û hişmendîya xwe ji nû ve çê bike, şêwazeke nû bidê. Ev yek wekî rêzikeke bingehîn hemû cureyên desthilatdariyê de heye. Bo nimûnê mêr jî li gorî daxwaz û berjewendiyên xwe şêwazê didin jinan, li ser beden, hebûn, hişê wan desthilatdariyêke kokdar û bibandorkar daydinin.

Belê, her desthilatdarî bona ku hebûna xwe bidomîne dixwaze ku bindestên xwe bi destê xwe ji nû ve çê bike, şêwazeke nû bide. Heya ku burjuvazî çîneke karkeran a li gorî hişmendî û berjewendiyên xwe çê neke nikare kedxwariya xwe bidome. Tirkbûn jî wisa ye. Tirkbûn jî îdeolojiyeke desthilatdar e û heya ku dijberên xwe bi destê xwe, li gorî hişmendî û berjewendiyên xwe ji nû ve neafirîne nikare hebûn û desthilatdariya xwe bidomîne. Ji sed salî zêdetir e ku dijberê Tirkbûnê Kurdbûn e. Tirbûn sed salê ku bi tirs û xofa Kurdan dijî û bona desthilatdariya xwe bikaribe bidomîne dikuje, qetlîaman dike bi her awayî dek dolabên cuda cuda digerîne. Vê axirîyê de Tirkbûnê dest bi afirandina "kurdên xwe" kir. Bi rastî jî modeleke wisa afirand ku Tirkperestên wekî Bekir Coşkun, Emîn Çolaşan, Ehmed Hakan jî dilê xwe avêtin vê modelê û pê şanaz bûn. Wekî tê zanîn bona hilbijartinan malbata Demîrtaş vîdeoyek kişandibû. Vê vîdeoyê de malbateke bi dê, bav û du zarokên Tirkîaxef pêk tên, bi ken û henek ji hevdu re xeber didin, bav amûrên muzîkê lê dixe û dayîk bi mest û dilxweş hevşerê xwe temaşe dike hatibû nişandayin.

Bi rêya vê vîdeoyê wêneye "Kurdbûna meqbûl" hatibû çêkirin. Bi milyonan Kurd li serê çiyan, gundan, li koşe bucaxên bajaran de wekî malbatên qerebalix û bi zimanê Kurdî dijîn. Ji mafên bingehîn ên neteweyî û mirovî bêpar in lê Tirkbûn Kurdan wekî malbatên biçuk û burjuva û Tirkîaxêf dixwaze.

Wekî tê zanîn ji dîroka komara Tirkan pê ve Kurdbûn wekî tiştekî "qirêj", "kîret", "bar" hatibû temsîlkirin û li gorî vê Kurd jî wekî mirovên wisa bûn ku her tim tundîyê dikirin, ji rûyê hevdu re nadikeniya, ji xweşiyên jiyanê ên wekî muzîk, wêje û helbestê fêm nedikirin. Lê êdî bi rêya Demirtaşê yurttaş (hemwelatî) û malbata wî Kurdbûneke nû, paqij û meqbûl hate afirandin.

Heke Kurd van dek û dolaban pûç dernexin û dilê xwe bavêjin "modela Kurdbûnê" a malbata Demîrtaş temsîl dike, Tirkbûne bi hêsayî Kurdên xwe yên meqbûl biafirîne.

Heya ku ev dek û dolab pûç neyên derxistin Kurd nikarin wekî neteweyekî hebûna xwe bidomînin.

# Nivîsên Piştî Hilbijartinê

Havîn Rûşa

**Xwedîyên Dewletê û Hêzen Navneteweyî AKP hilbijartin**

Belê xwedîyên dewletê AKP hilbijartin, encameke din dê sîstem biqitimandiya. Heke hilbijartina serokkomariyê bona tûra duyemîn bimaya, biserketîyên tûra duyemîn dê Partiya İYİ, HDP, Partiya Saadetê û Muharrem İnce bûna û ev yek dê rasterast sîstemê bixitimîne. Yanê heke Muharrem İnce wekî serokkomar bihata hilbijartin, tîfaqa AKP-MHPê ye meclîsê de bibûna pirayî û lewma jî bêyî destûra vê tîfaqê serokkomar nikaribû hîç biryarekî bide. Lewma jî xwedîyên sîstemê piştgiriya xwe dane Erdoxan û tîfaqa komarê. Xuya ye ku hêzên navneteweyî jî wiha dixwastin an na dikaribûn bi hêsayî li ser encama hilbijartinê bandor bikin.

**Divê AKP Rast Bê Fêmkirin**

AKP di tevahiya dîroka komarê de bûyereke resen e, naşibe hîç tiştekî din. AKP her çi qasî pişta xwe spartibe ji rabirdûyeke siyasî û îdeolojîk jî hêza xwe ya mezin ji van yekan nagire. Helbet di civakeke ku li gorî esasên sentezeka Tirk-Îslamî hatiye dîzaynkirin de AKP bi hêsayî dikare xwe organîze bike û bê piştgirîkirin. Lê belê meriv nikare AKP'ê bes bi van sedeman ve jî rave bike. Divê sedemên serkeftina AKPê yên dîrokî, çînî û civakî rast bên fêmkirin. Helwesta ku serketina AKPê bi gotinên derbarê dîn, meqarne ve rave dike him xeyrî-siyasî ye him jî elîtîst e.
Bo nimûne heya ku pêvajoya avabûna komarê û esasên bingehîn ên komarê, têkiliya navbera dewletê û dîn de, helwesta avakerên komarê a ku êrişkar û vederkirî li hemberî civata îslamî, civata nexwende ya gundî, çîna bindest a neperwerdekirî neyê dîtîn hêza AKPê jî nayê fêmkirin. Bo nimûne dewletên emperyalîst û desthilatdarên Tirk li dijberî tevgera çînî hewcedariya tevgera Îslamî dibînin û vê tevgerê her li gorî berjewendiyên
xwe zindî digirin. Heya ku ev têkiliya rast nayê fêmkirin pêvajoya avabûn û serketina AKPê jî nayê fêmkirin. Bo nimûne piştî 12 Îlonê tevgera îslamî bi destê dewletê ji nû ve hate birêxis tinkirin û heman tevger di salên 90î de di bin kontrola dewletê derket bû belaya serê dewletê û siyaseta Emrîkî û lewma jî Refah partî hate tasfîyekirin. Helbet heya ku ev bûyer rast neyên fêmkirin, AKP jî nayê fêmkirin. Bo nimûne tevgera Kurdan bêrawestan mezin û mezintir bû û paradîgamaya Kemalîst têk çû. Heya ku têkiliya navbera van her du bûyeran rast neyê fêmkirin AKP jî nayê fêmkirin. Bo nimûne girseya divê bi aliyê tevgera çepgir ve bihata birêxistinkirin bi laiyê AKPê ve hate birêxistinkirin û niha jî pişgirên AKPê yên herî aktîf ev girse ye. Heya ku ev mijara rast neyê fêmkirin AKP jî nayê fêmkirin. Belê, divê AKP rast bê fêmkirin an na ew nayê têkbirin. Heke bê têkbirin jî AKP'yeke nû bi hesayî dikare li ser heman bingehê cardin ava be.

**Gelo Muharrem İnca Çima Devê Xwe Guherand?**

Gelo Muharrem İnce çima li hemberî encama hilbijartinê îtiraz nekir? Sedema vê yekê tirs an jî tehde ye? Bo ku meriv vê mijarê bi tirs û tehdeyê ve rave bike divê meriv ji rastiya CHPê û Muharrem İnce ne haydar be. Wan ên ku dibêjin "madem te yê bitirsiyayî te çima xwe avêt li ber topê" siyasetê bi hişmendiya Erman Toroglî ve rave dikin. CHP jî wekî MHPê partiyeke dewletê ye û berjewendiyên dewletê her tim li ser berjewendiyên partiyan re digire. Heya CHP avakerê dewleta Tirkan û neteweya Tirkan e lewma jî pêşaniya CHPê her tim berjewendiyên Tirkbûn û dewletê nin.
Ev yek berê jî wiha bû niha jî wiha ye, vê şûn ve jî naguhere. Wan ên ku naxwazin vê yekê fêm bikin pêşiyê girseyên di bin bandora xwe de jî didin bawerîkirin dawiyê de jî çongên xwe dixin dibêjin; em hatin "xapandin."
De werin em vegerin li ser mijara Muharrem İnce. Muharrem İnce endamekî rêzê de nîn bû, ew senteza Erdoxan, Baxçelî û Akşener bû. Tekane cudahiyê wî ew e ku Muharrem Înce ji behna çepgeriyê hildane û hew.

Wekî vê Muharrem İnce kesekî faşîstirîn î di rêveberiya CHP de ye.
Dema ku xwedîyên sîstemê û dewletê dev ji Erdoxan berdan gengaz e ku kesekî wekî Muharrem İnce an jî Muharrem İnce xwe hilbijêrin. Sedema ku Muharrem İnce li hemberî encama hilbijarinê îtiraz nake tirs an jî tehde nîn e, ev mîsyona wî ye. Muharrem İnce li hemberî encama hilbijartinê îtiraz nekir û bangî pişgirên xwe nekir ku derkevin li sûkan ji ber ku ew baş dizane ku ev yeke zirarê bide sîstemê. Pêşaniya Muharrem İnce ew xwe nîn e, sistem û dewlet e, berjewendiyên Tirkbûnê nin. Her çi qasî destketiya Muharrem İnce ya niha serokkomarbûn nîn be jî ew ê bibe serokê CHPê.

**Derbarê Mijara Biratiya Rengan de**

Di pêvajoyên hilbijartinê de tim û tim balê dikşînin li ser biratiya rengan lê belê derbarê wateya vê gotinê de hîç tiştekî nabêjin. Ji kerema xwe bibînin ji bîra xwe hemû nivîsên di derheqa biratiya rengan de bi wêneyên tijî alaya tirkan û alaya HDPê ve hatin servîskirin. Navê wê jî danîne biratiya rengan! Wekî tê zanîn ev yeka yekem car di pêvajoya Gezîyê de kete rojevê. Mêrekî û jinekî destên hevdu girtibûn û direviyan ji destê mêrik de alaya BDPê û ji destê jinikê de jî alaya Tirkan hebû. Ev wêneya jî wekî wêneyê biratiya rengan û gelan hate servîskirin. Te bibêjî qey alên Tirk, Ermenî, Kurd, Ruman hatine digel hevdu û hîç kesî ji alaya neteweya din azic nebûye û heya ev yek wekî dewlemendî qebul kiriye. A ku wekî "biratiya gelan" bi me didin qebulkirin lap jî têgihîna biratiyê ya Tirkan e. Tirk bi ala xwe ya neteweyî, wekî neteweyeke serbixwe lê belê Kurd bi alayên partiyeke siyasî, ne wekî neteweyeke serbixwe tên temsîlkirin. Heya ku wiha nîn be Tirk navê vê yekê danaynin biratî. Heke Kurd bi nasnameya xwe ya neteweyî ve, bi ala xwe ya neteweyî ve derkevin li meydanan îcar navê wan dibê "dabeşkar" û "ewan." Kurd nikarin sembolên xwe yên neteweyî bi kar bînin bes dikarin sembolên partiyê bi kar bînin lê helbet divê ew partî jî bi israrî bibêje ku em partiya Kurdan nîn in, em partiya hemû Tirkiyê nin. Heke hemû ev şert û merc bi aliyê Kurdan ve bên bi cih êdî biratiya rengan jî pêkan dibe. A ku Tirk ji biratiya rengan fêm dikin ev e. Lê gelo divê bona Kurdan çi bê gotin? Ji ber ku di hemû pêvajoya hilbijartinê pê de Kurdan jî ev şert û mercên Tirkan qebul kirin û navê vê wêneyê wekî biratiya rengan pênase kirin. Heya ew qasî pêş de çûn ku hin Kurdan him di hilbijartinên 2015'an de him jî hilbijartina 24ê Pûşperê de ala tirkan dan destekî bi destê din jî ala HDPê girtin û derketin li meydanan.

**Bona Kurdên Piştgiriyê Didin HDPê Çend Pirs**

Pirsên me bo HDPê nîn in, bo kesên ku raya xwe didin HDPê nin. Lewre li gorî raya me HDP bona Kurdan xêzeke ku divê Kurd li ser re banzdin û derbaz bin. Bo vê sedemê jî ne hewceye em hîç pirsekî be jî ji HDPê bipirsin. Muxatabê van pirsan ew mirovên ku raya xwe didin HDPê nin. Bibînin ji bîra xwe ku dema partiya we hûn kiribûn li pey neteweperestekî wekî Muharrem İnce, siyaseta xwe û dahatûya we girêdayî tîfaqa xwe û Muharrem İnce kiribû, me li hemberî vê yekê îtiraz kir û got " bila dîrok dûbare nebe, me berdela tîfaqa berê ya di navbera HDPê û AKPê de bi qetlîamên Cizîr, Sûr, Kobanê û Efrînê da, ew tîfaqa hûn bi CHPê re daydinin jî encax dê wekî qetlîamên nû encam bide." Û piştî van gotinan em bi aliyê gelek kesan ve hatibûn êrişkirin. Hilbijartin kuta bûn û Muharrem İnce li gorî mîsyona xwe ya dîrokî tev geriya, wan ên ku duh qaşo pişgirî dikirin îro yek xulekî de ji bîr kirin. Niha em cardin li rûyê we disekinin û dipirsin; gelo we bêyî dubare kirina sloganên bêkêr û eletewşî yek xulekî be jî di derheqa mîsyona HDPê de fikirîn? Em bi rastî jî dixwazin ji we bipirsin; gelo heke Muharrem İnce biserketî bûya çi feydeya wî ye bigihîşta Kurdan? Dema ku HDPê got ku piştgiriyê bidin Muharrem İnce we bi kîjan sedem û armancan ev yek qebul kir? Ma heke Muharrem İnce biserketî bibûya gelo wî yê her çar bendên makezagonê yên esasî biguhertina? Gelo yê dagira li ser Efrînê kuta bikira? Gelo yê şaredariyên Kurdan bida ji destê Kurdan? Gelo yê razî bibûya ku Kurd bi sembol û mafên xwe yên neteweyî ve bijîn. Heke ku xewna Selehattin Demîrtaş rast derketa û aboriya Tirkiyê du katî zêdetir pêşve biçûya, nirxên demokrasîyê ên li welatên Ewropî bihatana qebulkirin, hin azadî bihatana pejirandin, gelo bi hemû van guhertinan para Kurdan dê çi bûya? Gelo Kurdan bona Tirkiyeke ekonomî û demokrasîya wê xurt bi hezaran ciwanên xwe binaxî kirin? Gelo armanca wan

ciwanên li ser çiya ev yek bû? Gelo dema dewleta Tirkan hûn wekî hemwelatî (yurttaş) qebul kirin, êdî armanca we bi cih tê? Li kudera dinyayê yek nimûneya wê dîsa heye ku neteweyeke mêtingeh bona ku bi aliyê dewleta mêtinkar ve wekî hemwelatî bên qebulkirin bitêkoşe?
Li ku dera dinyayê yek nimûneya wê dîsa heye ku partiyeke li ser hêz û dînamîkên neteweyeke mêtingeh bilind bibe lê vê neteweya mêtingeh bona ku dewleta mêtinker bêtir bihêz bibe birêxsitin bike û ew netewe jî vê yekê qebul bike?
Bila hemû ev pirs bila aliyekî din bisekinin û em ê tiştekî din bipirsin; heke em qebul bikin ku we êdî dev ji doza Kurdistanê berda û hûn bes dixwazin wekî hemwelatiyên Tirkiyê yên wekhev bijîn. Armanca we ew e ku hûn li welatekî bi aliyê demokrasiya burjuva ve tê birêvebirin, tu mirov nayên adinkirin û ekonomîya wê baş de bijîn.
Ev jî ser seran! Lê gelo hûn bi kîjan sedeman îkna bûn ku bi tîfaqa Muharrem İnce ve ev yek pêkan dibe? Ma hûn ji dîroka xwe ev qasî bêgane bûne? Ma hemû ew qetlîam, koçberî, feqirtî û talan hîç ji we de bîreke neteweyî, mirovî be jî çê nekir?
Gelo hûn çawa xwe qanî dikin ku partiya ku dewleta Tirkan ava kiriye û Muharrem İnceyê ji berê ve merivê dewleta Tirkan dixwazin alîkariya we bikin?
Belê divê AKP bê dorpêçkirin, jixwe dorpêçkirina AKPê dorpêçkirina pergalê ye. Lê belê dermanê vê ew nîn e ku îcar jî bi hêzên neteweperest re bikevî tîfaqê û wan bikî desthilatdar. Xwezila êdî Kurd dev ji jiberên xwe berdin û carekî jî bi awayekî cidî li ser van pirsan bifikirin.

## Déjà vu

Belê rewşa me ya heyî vê gotinê tê ravekirin: Déjà vu! Mabesta me çi ye? Belê, helbet mabesta me rewşa HDPê û encamên hilbijartinê nin. HDPê û tevgerên çepgir û "tevgera Kurdan" mil dane CHPê û li dijberî wesayeta AKPê tev digerin.
Wekî tê zanîn çend salan berîya vê jî "tevgera Kurdan" û hinek tevgerên çepkir digotin "AKP dijberî wesayeta leşkerî tev digere" û lewma jî bi awayekî sergirtî AKPê re tîfaq daynî.
Wê demê çi piştgirî çi jî hevkarî, hemû cure tîfaqên bi AKPê re hatibû daynin şaş nîn bû, rasterast sûc bû. Heke ku ew partiya "tevgera Kurdan" û hin tevgerên çepgir pişgirî didayê kêm zêde xwêdiyê heman armancan, xwedîyê heman nirxan bibûya meriv dikaribû bi hêsayê vê tifaqê wekî "şaşî" binav bikira.
Bo nimûne hin tevgerên çepgir ên berê piştgirî dabûn HDPê niha vê seknê wekî şaşî binav dikin û helbet gengaz e ku wiha binav bikin. Lê belê gava ku tîfaq bi partiyeke dewletê ve tê daynin, piştgiriya bo vê partîyê wekî şaşî nayê binav kirin.
Ev yek rasterast sûc e. Belê hemû partî û kesên berê piştgiriya xwe dabûn AKPê sûcdar in. Wan ên ku çi sergirtî çi eşkere piştgirî dabûn AKPê sûcdar in û wan ên îro piştgiriyê didin CHPê jî sûcdar in.
CHP partiya avakerê dewletê ye. Hemû armanc û bernameya wê jî bihêztir û bidomdartir kirina dewletê ye.
Lê divê çi bê kirin?
Peywira sosyalîstan ne ew e ku bangewaziya partiyên dewletparêz û mîsak-î mîllîparêz bikin û li dora dijbertiya AKPê re tîfaqan ava bikin. Ev yek rasterast dişibe kirina Stalîn a li Spanya, Fransa û Yewnanîstanê. Divê heman yek neyê dubarekirin.
Divê sosyalîst kirinên Bolşevîzmê yên di Şerê Yekemîn a Purtvekirina Emperyalîst de kiribûn dubare bikin.
Divê bangewaziya Troçkî ya ku li hemberî hêzdarbûna faşîzmê bo çîna karker a Almanan kiribû bê dubarekirin.
Helbet hemû van gotinên li jorê ne ji bona tevgera Kurdan in. Ji ber ku tevgerên neteweyî dijberî sermageriyê nîn in. Lê belê pîvana ku tevgera Kurdan bi hêzên din re tîfaqê dayne dijbertiya AKPê û "têkoşîna bo demokrasîyê" nabe.
Pîvana sereke a tîfaqê dij-mêtinkarbûn e, dijbertîya dagirkerîya li ser Kurdistanê ye.

# Nivîsên Efrînê

Şernas Vîyan

**Nîşejêr:**

Kovara me 3 mehan carekî derdikeve lewra jî em nikarin sekna xwe ya di derheqa rojevê de roj bi roj bi xwendevanên xwe re parve bikin. Lewre me hemû nivîsên di derheqa êrîşa li hemberî Efrînê de di bin vê sernivîsê de kom kir.
Ev nivîsana li ser rûpelên me yên torên medyayê jî hatine parvekirin. Ji destpêka êrîşa li hemberî Efrînê ve heya pêvajoya dagirkirinê û têkoşîna li hemberî vê dagirkerîyê gelek tişt hatin gotin, nivisîn û nîqaşkirin. Em hêvî dikin ku bi saya van nivîsan ev pêvajoya bi awayekî din jî bê xwendin û nirxandin.

## Gelo Dagirkirina Efrînê Çawa Bê Astengkirin?

Hêzên dagirker ên Tirkan Efrîn dorpêç kirine. Helbet gelê Efrînê û bi wekî hêzên çekdar yên gel YPG jî amade nin ku Efrînê biparêzin. Lê belê ev yek têr nake ku hêzên dagirker têk bibe. Mixabin hêz û derfet bi awayekî eşkere ne wekhev in.
Lê gelo meriv çawa bikaribe dagirkeriya Tirkan berasteng bike? Hêza bingehîn a ku bikaribe dagira Tirkan berasteng bike, berxwedana gelê Efrînê û YPG ye. Jixwe ev berxwedana jî 6 mehin berdevam dike.
Dereng be jî divê hin hêzên din jî tevli vê pêvajoyê bibin. Heke hêzên din midaxleyî vê pêvajoyê nekin him Efrînê bê dagirkirin him jî hêzên Tirkan yê nîjadkujîyeke mezin bikin.
Bona ku encama şêr bi awayekî baş bê guhertin divê hîç nebe felîteke din derkeve ji ser dîka şêr.
Hêza ku Tirkan berasteng bike ku vekişin Amerîka, YM (yekitiya miletan) an jî rejîma Esad e ku ev rejîma jî bi pişgiriya Îran û Rusyayê li ser piyan dimîne. Ev hêzana an jî ev ji van hêza dikare ku tevli vê pêvajoyê bibe û Tirk vekişin. A herî zû encam bide jî ew e ku yek ji van hêzan destekariya vê pêvjoyê bike.
Hêza duyemîn a dinamik jî hêza Kurdan xwe ye. Divê Kurd li ku derê bin li wir ra bin li ser piyan ku li hemberî dagirkeriyê qadeke berxwedanê ya din jî ve bikin. Yanê bi kurt û kurmancî divê hêza Tirkan a ku li Efrînê Kurd dorpêç kirine, îcar bi aliyê Kurdan ve bi taybetî li bakûrê Kurdistanê û bajarên Tirkan ên mezin de bê dorpêçkirin. Helbet eşkere ye ku li hemberî hêzeke dewletê ya xwedî çêkên giran û çekên kîmyevî em nikarin şerê sûkan, şerê bajaran têk bibin. Loma jî divê qadên şer bên berfirehtir û dewleta Tirkan li her derê bê dorpêçkirin. Bona ku ev yek bê kirin jî divê ev şera berbelavî li bakûrê Kurdistanê û metropolên Tirkan be. Yanê divê gerîlla her li ku derê be li wir dest bi şerê giran bike û nifûsê Kurd jî li her ku derê be li hemberî dewleta dagirker serî ra bike ku qadên têkoşînê berfirehtir bibin. Helbet ev yek bi tenê berpirsiyariya Kurdên Bakûr nîn e. Divê Kurdên Rojhilatê û Başûr jî li hemberî dagirkerîya Tirkan dest bi seferberîyê bikin. A ku hêzên bibandorkar ên bi wekî Amerîka, YM (yekitiya miletan) neçar bike ku tevli pêvajoyê bibin jî berxwedana Kurdan e. Dawiya dawiyê de Efrîne bibe Vîetnama Tirkan, baweriya me ji vê yekê tam e. Ev "serdema" ku bi aliyê Tirkan ve bi wekî "serdema Tirkan" tê bi navkirin dê li Efrînê biveke binê erdê. Lewma jî divê zûtirkê şerekî girseyî bi aliyê Kurdan ve bê destpêkirin an na kes Kurdan ji komkujîyên nû rizgar nake.

## Di Derheqa Dagira li Ser Efrînê de

Xuya ye ku hêzên çavên xwe kutane Efrînê berîya êrîşa dagirê gelek dek û dolab tevgerandine. An na, gelo divê sekna Rusya, Îran û Suriyê çawa bê ravekirin?
Plana wan ev e ku heke Tirk bikaribin Efrînê dagir bikin, destûrê nadin dewleta Tirkan ku li Efrînê bimîne.

Bi hin bazarîyan dewleta Tirkane qebul bike ku rêveberiya Efrînê teslîmî Esad bike û xwe jî derbasî li ser xetê be, sînor ji destê xwe de bigire. Bona vê sedemê ye ku Esad bi sergirtî be jî piştgiriyê dide dagira Tirkan. Rusya û Îranê jî bona ku destê Esad xurttir biki bi awayekî sergirtî destûr dan Tirkan ku Efrînê dagir bike. Jixwe ya di dilê rejîma Esad de bi aliyê dewleta Tirkan ve tê kirin.

**Lê Belê Divê Sekna Amerîkayê Çawa Bê Şîrovekirin?**

Bona Amerîkayê Efrîn girîng e lê Amerîkayê her armanca xwe jî bi Efrînê ve girê nedaye. Rojava bes parçeyekî plana Amerîkayê ye. Amerîka dixwaze cardin desthilatdariya xwe li hemû heremê saz bike. Lewma jî Amerîka ne ji bo Efrînê ne jî bajarekî din î Kurdan dev ji plana xwe ya demdirêj bernade.
Belê Amerîkayê piştgiriya çekî bide YPG'ê lê bi xwe nakeve li nav şer. Heya ku ji destê Amerîkayê de sedemên ku rasterast bikeve li nav şêr nîn in. Hêza dagirker endamê NATOyê ye ku ev yek jî lap zehmettir dike ku Amerîka midaxle bike.
Lê divê gelo çi bê kirin?
Bona ku hêzên Kurdistanî ser bikevin divê hevsengîyên navnetewî baş bên fêmkirin û helbet divê hevkarîya navnetewî bê peydakirin. Lê ev jî bi tena serê xwe têr nakin!
A ku dikare hemû pêvajoyê biguherîne hêmanên navxweyî ne û heya ev hêmanan dikarin li ser sekna Amerîkayê jî bandoreke erênî bikin.
Me heman yek di pêvajoya ku Kobanê hatibû dorpêçkirin de jî gotibû.
Lê em ê dîsa dubare bikin: a ku bikaribe dorpêçê ji holê ra bike ew e ku em dagirkeran dorpêç bikin. Yanê divê dewleta Tirkan a ku niha Rovaja dorpêç kiriye li bakûrê Kurdistanê û bajarên mezin ên Tirkan bê dorpêçkirin.
Wekî nimûne sedemeka Amerîka neçar ma ku ji Vîetnamê vekişe jî tevgera sûkan a li Vîetnamê bû. Heke dest û piyên dewleta Tirkan di "hindur" de ev qasî serbest be helbet ew ê bikaribe di "derve" jî bi serbestî pirêzeyan bike. Divê hêzên Kurdistanî ên li çawirdorê dinyayê û hêzên yarmetiya Kurdan dikin di her qadê de pêşîya dewleta Tirkan bigirin.
Hêza herî girîng a ku dikare çarenûsa şêr biguherîne jî berxwedana li bakûrê Kurdistanê û bajarên metrepol e.

**Xezeba Kurdane Tirkbûnê Têk bibe**

Çarenûsa Tirkbûnê girêdayî dagirkirina Kurdistanê ye. Heya ku Kurdistan di bin dagira Tirkan da be, Tirkbûne jî hebûna xwe û encamên vê hebûnê bidomîne. Jixwe wateya Misakî Mîllîya Tirkan, dagirkirina Kurdistanê ye. Heke dagira Tirkan têk biçe, Misakî Mîllî jî namîne. Heke Mîsakî Mîllî têk biçe, paradîgmaya Tirkbûnê xwe spartiyê jî hildiweşe. Lewma jî dewleta mêtinkar a Tirkan hemû plana xwe ya şêr li ser têkbirina vejîna Kurdan saz kirîye. Lewma jî dewleta dagirker çavên xwe kutaye dagirkirina Efrînê. Bi heman sedemê ji meznûnên Balyozê fermandarên bi wekî Ahmet Yavuz, rojnamevanên bi wekî Nedîm Şene, pîsporê ASAMê Eray Güçlüer û çi qasî pîsporên Îslamparêst, Turanparêst û neteweperest hebin bi heman tirsê mil didin hevdu û bi yek dengî li hemberî Kurdan êqil didin dewleta xwe. Heman tirs e ku ji meclîsê bigirin heya sûkê Tirkbûnê dike yekpare. Lê pêşgotineke qedîm dibê ku feydeya tirsê nîn e. Desthilatdariya Tirkan dê bi destê Kurdan têk biçe.
Çi zû çi dereng ev yek wiha ye…
Berxwedana Kurdan dê Tirkbûna ku xwe li ser koletîya Kurdan avakiriye kuta bike!

**Divê Hilweşe**

Belê em qala Tirkbûnê dikin. Bi herî dawîn Moxolan Tirkbûn hilweşiyandibû. Lê ji wê dîrokê vê de Tirkbûnê tu carî rûyê têkçûnê nedît heya ku xwe bi rêya têkbirinê ve gav bi gav saz kir. Heya roja îroyîn jî hebûna xwe bi saya şer û rûxandinan ve derdevam kir.
Mixabin divê rasterast bê qebulkirin, sedemeka rê da ku Tirkbûn heya niha hebûna xwe bi şer û rûxandinan, bi komkujiyan ve bidomîne û bikaribe desthilatdariya xwe gav bi gav bihêztir bike Kurdbûn e. Tirkbûnê bi saya Kurdan ve piyê xwe avêtiyê vê erdnigariyê, li vê derê cîwar bûye û împaratorî û komara xwe ava kiriye. Helbet, Îslam jî tevahî gelek sedemên vê yekê henin lê em niha nakevin vê mijarê.
Lê belê tişteka wiha jî heye ku berpirsiyariya siyasî ya ku Tirkbûn hê jî dikare hebûna xwe bi wekî dewletekî bidomîne li stûyê serokên Kurdan e.
Heya ku bêbasîretiya serokên Kurdan neyê nirxandin ev dîroka nayê têgihîştin. Helbet pêşiya gotiye; ya bû êdî nede dû. Lê belê encamên divê ji rabirdûyê bên girtin jî girîng in.

Lewre bona ku em bikaribin îroya xwe ava bikin divê em rabirdûyê baş fêm bikin. Hêza weranker a ku jê re dibên Tirkbûn ne bi tenê pêşeroja Kurdan, pêşeroja hemû gel/neteweyên li vê erdnigariyê tehdît dike. Hêza ku rê da Tirk bikevin vê erdnigariyê û cîwar bibin Kurdbûn bû, tekane hêza dikare ku Tirkbûnê têk bibe jî dîsa Kurdbûn e. Kurdbûn bi wekî jehrkuşa Tirkbûnê ye.

**Tu Cudahiya Mêtinkaran Nîn e**

Ji nav mêtinkaran de çi rastgir, çepgir, faşist, demokrat, sosyal demokrat, pêşverû an jî paşverû be jî hîç cudahî nîn e. Mêtinkar mêtinkar e. Wekî nimûnê dewletên bi wekî Hollanda, Fransa, Îngiltere ku dewletên herî demokratiktir tên qebulkirin, dewletên mêtinkar ên sereke nin. Fransa û Hollanda dema ku di pêvajoya Şerê Duyemîn ê Emparyalîst de dûcarî êrîşa Almanyaya faşist hatibûn de jî dewletên mêtinkar bûn. Dema meriv ji dewsa pênaseya "mêtinkar" têgihên bi wekî rastgir, çepgir an jî demokratîk ji bona van dewletan bi kar tîne rengê mijarê diguhere. Mêtinkarbûna dewletan bi vî awayî tê veşartin. Lewma jî divê navê van dewletan çi be em rasterast vî navî hildin. Jixwe hîç têkiliya taybetmendiya rejîma dewletan û mêtinkarbûnê nîn e. Yanê dibe ku dewlet him mêtinkar him jî demokrat, faşist, şerîatparêz, rastgir an jî çepgir be.
Lewma jî pir girînge ku dema Kurd pênaseya dewleta Tirkan dikin li gorî vê yekî peyvên xwe hilbijêrin û heya ku balê dikşînin li ser têgihên bi wekî "faşîst, paşverû" divê rasterast taybetmendiya dewleta Tirkan a mêtinkarbûnê derxin li pêş.
Hêmaneke din a girîng jî ew e ku her kî dibe bila be, ew kesê hebûna dewleta Tirkan a li Kurdistanê bi wekî mêtinkarî pênase neke ew jî tevkarên mêtinkariyê nin. Kêsên tixûbên Misakî Mîllîya Tirkan qebul dikin bi awayekî eşkere tevkarên mêtinkariyê nin.
Hîç eleqeya vê yekê û çepgirbûnê, rastgirtbûnê, faşîstbûnê, oldarbûnê heya "sosyalîstbûnê" nîn e.
Yek şerta ku kesek an jî tevgereka siyasî têkiliya xwe û mêtinkariyê bibirre ew e ku bê şert û merc dijberî hebûna dewleta Tirkan a li Kurdistanê be.
Divê ne bi tenê Efrînê, li Amedê jî hebûna dewleta Tirkan raserast bi wekî dagirkerî û mêtinkarî pênase bike.

**Tirkbûn Fenomeneke Sosret e**

Li gorî nûçeyên nû Yekitiya Ereban êrîşa Tirkan a li Efrînê şermezar kiriye.
Li hemberî vê nûçêyê berteka Kemalîstekî navdar (berê jî xwe bi wekî dostê Kurdan da bû qebulkirin) wiha bû: "ox çi xweş!
Bila ev yek ji hezkirîyên Ereban (mebesta wî Erdoxan û çeteya wî ye) re bibe ders!" Berdevamiya gotinên xwe jî wiha aniye: "Jixwe bi îxaneta Ereban ve Quds ji destê me çû!"
Belê, ev gotineke wisa ye ku encax Tirkek dikare gotinên wiha eletewşo bike. Encax Tirkek dikare gelekî/neteweyekî li hemberî dagirkeriyê welatê xwe, mala xwe diparêze bi îxanetê ve sûcdar bike. Ji ber ku Tirkbûnê wateya îxanetê jî li gorî xwe guhertiye. Heman Tirkbûn, Kurdên li hemberî dagirkerî û mêtinkariya Tirkan berxwe didin jî bi îxanetkariyê ve sûcdar dikin. Te bibêjî qey hevpariyeke dilî heye lê paşê hevkarek ji yê din re îxanetê dike!
Ji qada Efrînê jî nûçeyeke nû hat! Artêşa dagirker ji balafirên şer bi hezaran belavok reşandine li ser gel. Di van belavokan de bi zimanê Tirkî dibê ku "Efrîn a Efrînîyan e!" Yanê dibê ku "yên ji Efrînê nîn bin bila derkevin biçin!" A ku ji derve tê, Efrînê dagir dike ew in, lê yên ku vê belavokê direşînin û dibên "Efrîn a Efrînîyan e!" jî disa ew in. Ev kirû jî hebe nebe kare Tirkbûnê ye. Êdî ev kirinên wan kenê mirîyan tîne! Dibê ku Tirkbûn bi kirinên wiha ehmeqane ve me dide kenê ku hêrsa me kêmtir bike…

**Roketên Ketin Li Kilîs û Reyxanliyê Aîdî Kê Nin?**

Bi taybetî ji salên 90î de kinyê mirovek "bi awayekî" bihata kuştin, medyaya şêr ji nişke ve derdiket li mederê û bi sernivîsa "PKKê sivîlek kuşt" ve bi rojan propoganda dikirin. Çend salan paşê derket li holê ev kesên "bi awayekî" hatine kuştin bi deste dewletê û li gorî hin armancên dewletê hatine kuştin.
Ev yek amûreke şêr a dewletê bû. Di salên 90î de hate bi karanîn û heya rêjeyekî serkeftin jî ji dest xistin. Li van rojên dawîyê heman senaryo dîsa kirine rojevê.
Îcar mijara wan roketên ku ketine li Kilîs û Reyxanliyê nin. Ev roket bi aliyê kî ve tên avêtin? Divê meriv hîç nekeve ji van gengeşeyen ji ber ku armanca van gengeşeyan ew e ku mijare rasteqîn bi awayekî bidin ji bîrkirin.

Fikr û gotin çi dibe bila me, dema meriv dikeve ji nav van gengeşeyan bi awayekî berevajî propogandaya vir û derewên wan tên kirin.
Dewsa ku em tevli van gengeşeyan bibin, em bi awayekî eşkere wiha dibêjin: "Welew ku ev roket bi aliyê têkoşerên Kurd ve hatibin avêtin, dîsa jî faîl/kirde dewlet e.
Li wê derê şer heye û sedema vî şerî êrîşa dewleta dagirker e."
A ku divê bê rexnekirin encam nîn in, sedema vê encemê nin. Sedem jî hebûna dewleta Tirk a li Kurdistanê ye. Êrîşa dewleta Tirkan a li qadên Kurdan e.

**Sercerdevan ji bona Surîyeyîyan Cerdevanî Pêşniyar kir!**

Belê em qala Qiliçdaroxlî dikin. Qiliçdaroxlî dibê ku, "Di bin destê me de ev qas penaber henin. Gelo em çima leşkerên xwe li wan deran bidin kuştin. Divê em perwerdeyê bidin Surîyeyîyan bila ew vegerin li Surîyeyê şer bikin." Lê belê yê hemberî kî şer bikin? Li hemberî Dewleta Tirkan, Rusya an jî Amerîkayê? Helbet na! Lê gelo xêncî van hêzan li Surîyê hêzên dagirker henin? Helbet na!

**Ev jî qaşo "Tirkên dost" in**

Belê, em qala Cuneyt Ozdemîr dikirin. Ev kesê Kemalîst di cotmeha 2014'an de li ser dorpêçkirina Kobanêyê wiha nivîsîbû:

"Heke îro artêşa Kurdan xwe nîn bûya: gelê sivîlî li Kobanê yê bi aliyê kê ve bihata parastin?
Tîrkiye?
Suriye?
An jî Îran?
Lê gelo divê meriv ji wan Kurdên cehş ku digotin bila PKK dest ji çekan berde re çi bibêje?
Heke Kobanê têk biçe û jinên Kurdan bikevin ji destê İşîdê, gelo hûnê namusa xwe bi penûsê û wê hişmendiya we ya nîv-entel ve biparêzin? Lê heke çîçikek be jî namusa we ma be!
Welhasil divê KURD Jİ VÎ WARÊ GURAN TU CARÎ DEST Jİ ÇEKAN BERNEDİN!"
Îcar sal 2018 ye û ya ku İşîdê di sala 2014'an de li Kobanê dikir îcar bi aliyê Dewleta Tirkan ve êrîşa dagirê li ser Efrînê ye. Lê belê, heman Cuneyt Ozdemîr a li hemberî vê yekê çi dibêje? Belê ev jî gotinên Cuneyt Ozdemîr: "Helbet Tirkiye destûrê nade ku YPG li ser tixûbên dewletê xwe birêxistin bike, çekdarî bibe û xeteka Kurdan pêk bibîne!"

Pêşgotineke Tirkan dibê ku "Ayıdan post, Kürt'ten dost olamaz/ Ji hurçê post, ji Kurdan dost çê nabe..." Tirk wiha dibêjin ji ber ku ew baş dizanin ku di navbera dagirkeran û neteweya dûcarî dagirkeriyê hatiye de tu carî dostanî pêk nayê.
Dizanin bona bi Kurdan re dostaniyeke rasteqîn daynin divê pêşiyê dev ji dagirkeriyê berdin. Jixwe wê deme jî Tirkbûn namîne. Mixabin a ku bi aliyê kujer ve baş tê zanîn bi aliyê kuştî ve bi zanetî tê ji bîrkirin. Heçku divê heman yek bi aliyê Kurdan ve baş bihata zanîn: ji hurçan poşt çê dibe lê ji Tirkbûnê bona Kurdan dostanî çê nabe!

**"Ev Şerê Xaç û Heyvikê, Îman û Înkarê, Heq û Derewê, Kafirî û Tewhîdê ye"**

Ev hevokana bi aliyê efserekî Tirkan ku li Efrînê bi aliyê YPGê ve hatiye kuştin ve hatiye nivisîn. Belê, ev hevokana di nameyeke efserê Tirk bona malbata xwe şandiye de hatine nivîsîn. Ev hevokana nîşaneya "Xewna Turana Mezin" in.
Ev sonda Tirkbûnê ye ku dema ji Moxolan direviyan ji serê şûrê wan li ku derê bikeve ew der wêrane dikirin û li ser navê Tirkbûn û Îslamê hildidan di bin zaptûrapta xwe, ku heman sondê hebûna ji eşîrên Oxizan bigirin heya Împaratoriya Osmanîyan ji wir re jî heya komara Tirkan her tim domandiye. Sonda Tirkbûnê dê li Efrînê têk biçe û hebûna xwe ya hezar salî bavêje ji nav ava Firadê.
Dibe ku em bi ser nekevin, Tirkbûn dîsa biserketî bibe bi wekî berê dê mirov zarokên ranaezên bi gotina "huş be an na ez ê te bidim Tirkan" ve bitirsîne.

**Sekna Kurdistanî Kîjan e?**

Şertên bingehîn ên Kurdistanî ew in ku; divê rasterast dijberî dagira li ser Kurdistanê bin û mafê Kurdan î biryara avakirin an jî avanekirina dewleteka neteweyî bê parastin yanê divê li ji mafê Kurdan î diyarkirina çarenûsa neteweyî her tim bê parastin. Ev şert her tim wiha bûn, vê şûnda jî naguherin. Yanê ev şertnan li gorî zemên, şert û mercan û konjoktorê naguherin.
Ev rêgezek e, şerta bingehîn a Kurdistanîbûnê ye. Lê belê ev bi tena sere xwe têr nake, divê

sekn, siyaset û gotinên rojane ji li gorî vê rêgezê bin.
Wekî nimûnê îro girîng e ku her kes dijberî dagirkerîya li ser Efrînê be, lê belê ev yek têr nake. Divê ne bi awayekî tehmsar bes bibêjin ku em dijberî dagira li ser Efrînê nin di heman demê de divê rasterast berxwedana Efrînê jî silav bikin. Kurdistanîbûn ne ew e ku bes bibêjî "ez dijberî dagirê me."
Heya ku çi partî, kes an jî rêxistin be divê him dijbertiya xwe ya li hemberî dagirkeriyê îlan bike him jî berxwedana li Efrînê silav bike.

**De ji Biratîyê Binêrin!**

Belê mabesta me li ser Tirkên ku ji sibê de heya êvarê çîrokên biratîyê ji Kurdan re dibêjin e. Ev efendîyan him li pey leşkerên xwe yên dagirker digirîn, şînê digerînin lê heman demê de gotina "birayên me yên Kurd" ji devê wan kêm nabe. Ew mucahîdên DAÎŞÊ ku êrişî Kobanê kiribûn çi bin, leşkerên Tirkan ên niha êrişê Efrînê kirine jî ew in, her du jî dagirker in, armanca her du yan jî yek e. Lewra jî wan ên him behsa biratiyê dikin him jî ji bona leşkerên Tirkan hêsran dibarînin sextekar in, tu carî ji wan bawer nekin. Tu carî ev kes ji Kurdan re nabin bira. Bona ku em bikaribin ji biratiya wan bawer bikin divê pêşiyê ji leşkerên Tirkan re rasterast wiha bibêjin; "çekên xwe li hemberî Kurdan ra nekin, berê çekên xwe vegerînin dewleta xwe." Ji bona em biratiya wan bawer bikin divê ji bona mirîyên Kurdan şînê bigerînin ne ji bona leşkerên dagirker.

**Ger Wiha Berdevam Bike Em ê Rehmetê Ji Rihê Mandelayî Bînin**

Jo bona Mandela pênaseyeke wiha hatibû kirin "Mirovê ku bi aliyê çêrmspîyan ve peykera wî hatiye çikandin." Dema ku me hevpeyvîna Fîkrî Saxlarê CHP'yî li ser rûpela bi navê Ahval a rojnameya "Guneş" a Tirkan xwend, bi yekserî ev pênaseya ku ji bona Mandela hatibû kirin hate ji bîra me. Fîkrî Saxlar gelek gilî gotin kirine lê em ê bes li ser du mijaran bisekinin. Mijara yekemîn gotinên Fîkrî Saxlar yên di derheka Demîrtaş de nin. Fîkrî Saxlar wiha dibêje: "Demîrtaş ji bona çareserkirina pirsgirêka Kurdan û Tirkîyêyîkirina Kurdan kesekî girîng e. Ew kesên ku Demîrtaş ji van karan dûr dixin, dixwazin ku pirsgirêka Kurdan çareser nebe, dawîya pêvçûnê neyê, ev pirsgirêka mayînde bibe. Demîrtaş siyasetmendarekî girîng bû ku wî bes ne ji bona Kurdan, ji bona komên etnîk yên din jî jiyaneke ku her kes li hemberî hevdu rêz bigire, ji hevdu bike dixwast. Demîrtaş li ser navê demokrasîyê berdelê dide ku yên ji bona vê yekê berdelê didin bi aliyê gel ve tên xelatkirin."
Gotineke wiha çend salinan berê ji bona Ocalan jî hatibû gotin û gelemperîya Kurdan bi vê gotinê şanaz bibûn. Kî gotibû naye ji bîra me (dibe ku Avnî Gurel an jî Hasan Cemal be) lê belê rasterast wiha gotibû; "Divê dewlet peykera Ocalan biçikîne!" Mijara duyemîn a ku Fikrî Saxlar di derheqê de xeberdaye jî ev e:"Helbet Efrîn bajarekî Esad e, bi awayekî sirûştî ev yek wiha ye. Heke hêzên fermî ên Esad destûrê nede, em nikarin bikevin Efrînê, an na em ê bi wekî dagirker bên qebulkirin."

Yanê dibê ku heke Efrîn ji destê YPGê de be dewleta Tirkan dagirker nîn e lê heke Esad li wir be Tirkiye yê bikeve rewşa dagirkeriyê. Ji ber ku Efrîn bajarê Kurdan nîn e, bajarekî Surîyê ye. Xuya ye ku Fîkrî Saxlar YPGê bi wekî hêzeke dagirker dibîne. Dibe ku xwedevanên me bibêjin; jixwe Fîkrî Saxlar kemalîstekî rezîl e, helbet ew ê dijmintiya Kurdan bike. Ma bi me çi ji van gotinan?
Helbet mijar ev qas hêsa nîn e. Hêsa nîn e ji ber ku heke ev kemalîstên dijmin ji bona serokên siyaseta Kurdan de pesnên wiha bibînin ziman divê em vegerin ji xwe binêrin. Gelo kîjan kiryar, gotin, siyaset an jî rewşa serokên Kurdan kêrî dijminan tên? Xuyaye ku di hişmendîya siyasî a Fîkrî Saxlar de tu guhertin nebûye lê divê em vegerin ji siyaseta xwe binêrin ku gelo kîjan rêbazên girîng hatine guhertin. Jixwe Fîkrî Saxlar sedemên ku çima Demîrtaş bi wekî kesekî girîng û baş dibîne wiha rave dike: "Demîrtaş ji bona çareserkirina pirsgirêka Kurdan û Tirkîyêyîkirina Kurdan kesekî girîng e." Kakilê vê gotinê ev yek e: Demîrtaş mijara Kurdan ji pirsgirêka neteweyîbûnê dûr xist û ev mijara wekî mijareka navxweyî a Tirkîyê û bi wekî mijareke demokrasîyê pênase kir." Pirsgirêkek ev e. Pirsgirêka din jî ew e ku Fîkrî Saxlar Efrînê bi wekî bajarekî Surîyê dibîne û dibê ku heya Efrîn ji destê Esad da be divê Tirkiye nekeve Efrînê, lê heke ji destê YPGê de be ev yek jixwe ne dagirkerî ye. Lê belê girseyên Kurd li hemberî van gotinan dilşad dibin, vê hevpeyvînê parve dikin û dilê xwe bi van gotinan xweş di-

kin. Belê bi rastî heke wiha berdevam bike divê dewleta Tirkan bes ne peykerê serokên Kurdan, heya peykerê hemû Kurdan biçikîne.

**YPGê Arteşa Esad Vexwend li Efrînê**

Wekî ku tê zanîn YPGê arteşa Esad vexwendibû li Efrînê û rêvebirîya Esad îcabetî vê dawetê kiribû.
Ji nav Kurdan de yên li hemberî vê yekê şa bûn jî hebûn yên ku dijberîtiya vê yekê kirin jî hebûn. Kurdên dijbertiya vê yekê wiha digotin: "Madem ku we yê Efrîn bida ji destê Esad, we çima şer kir?"
Ev sekneke ne rast û durist e!
Bes kesên ku kakilê vê mijarê fêm nekiribin an jî armanca wan a fêmkirinê tune be dikarin sekneka wiha nîşan bidin.
Sedema ne rastbûna vê seknê ya yekemîn ew e ku YPG û PKK jixwe ji sêrî de xwedîyên sekneke dijberî Esad nîn in. Jixwe ji destpêka hewla DAÎŞê ya dagirkirina vê erdnigarîyê pê de di navbera YPGê û Esad de peymanek heye û li gorî vê peymanê Esad ji rojavayê Kurdistanê vekişiya bû.
A duyemîn jî ew e ku ji salên 80'yî û 90'î pê ve PKKê li newala Bekaayê bi destûra Suriyê kampên xwe li darxistibûn û bi wekî berdela vê jî PKKê li hemberî Surîyê (ku Surîye jî yek ji dewletên Kurdistan ji xwe re kirine mêtingeh e) şer nekiribû.
Dibe ku meriv li gorî hin sedemên cuda cuda vê yekê rast an jî şaş bibîne lê belê rewşa heyî ev bû. Sedema Sêyemîn jî ew e ku li gorî paradîgamaya ku YPG diparêze Rojava jixwe wekî heremeka Suriyê tê pênasekirin û Suriyeyeke ku federatîf/demokratîk tê parastin. Lewma jî li gorî paradîgmaya YPGê artêşa Esad hêzeke dagirker nîn e. YPG artêşa Esad wekî artêşa navendî a Suriyê pênase dike û bi vê sedemê jî bangî vê artêşê dike ku pêywira xwe bibîne li cih.
Yanê heke ku em li dijberî vê vexwendinê bin divê em pêşiyê dijberî projeya YPGê ya ku "Suriyeya demokratîk" bin.
Lê belê YPG vê paradigmayê diparêz ê lewre normal e ku artêşa Esad jî vexwîne rojavayê Kurdistanê. PKK/YPG xwedîyê bername û stratejîyeke ku li çawirdora Kurdistanê şerekî dijmêtinkarî pêk bibîne nîn e. Bi esasê xwe de bernameya PKK/YPGê dij-mêtinkar nîn e.
Bes, helbet PKK/YPG li hemberî dagirkeriyê berxwe dide. Lê belê dagirkeriyê jî li gorî berjewendiyên xwe pênase dike. Wekî nîmûne, niha li gorî PKK/YPGê hêzên dagirker dewleta Tirkan û Daiş e. Bi awayekî teorîk Îran, Îraq û Suriyê jî dagirker in lê li gorî sekna siyasî û pratîkên niha hêzên dagirker dewleta Tirkan û Daiş e.
Tevgerên neteweyî, tevgerên dij-mêtinkar in lê PKK/YPG li gorî paradigmaya xwe ya heyî bi wekî tevgereka neteweyî nayê pênasekirin. Helbet PKK/YPG felîta xwe dispêre Kurdan û ji bona berjewendiyên neteweya Kurd berxwe dide lê belê ev nayê wê wateyê ku PKK/YPG bi wateya klasîk/berbelav ve tevgereka neteweyî ye. PKK/YPG wekî tevgereke ku ji bona mafên wekheviyê berxwe dide tev digere. Ji bona rizgariya neteweyî berxwe nade, bes ji bona mafên wekheviyê berxwe dide. Lewre jî dema meriv li gorî bernameya YPGê û armancên YPGê yên stratejik dinêr e, tu şaşî nîn e ku YPG artêşa Esad vexwîne li Efrînê. Bibînin ji bîra xwe, dema ku Daîşê êrişî Kobanê kiribû HDPê jî bangî dewleta Tirkan kiribû ku midaxleyî Kobanêyê bike.
Ji ber ku li gorî bername û siyaseta HDPê jî dewleta Tirkan dagirker nîn e, bakûrê Kurdistanê jî heremeka Tirkiyê ye.
Di navbera van her du dawetan de hîç cudahî nîn e. Dema ku meriv van rastiyan dide ji ber çavên xwe û cardin mijarê dinirxîne derdikeve mederê ku gotina wan ên dibên "madem we yê Efrîn bida Esad, we çima şer kir?" bê kêr e.

**Dagirkerî, Loqim û Hêwirzeya Erdoxan**

Haya her kesî ji mijara loqiman heye, jixwe Erdoxan bes ji bona vê mijarê derket li hemberî mîkrofonan.
Wekî ku tê zanîn artêşa dagirker a Tirkan û endamên çeteya paramîlîter ya wekî "artêşa azad ya Suriyê" tê bi navkirin 18yê adarê de navenda Efrînê dagir kiribûn û ev yek li dinyaya Tirkan de bû wesîleya hin pîrozbahîyan. Bi rastî ev yek baş rave dike ku dagirkerî, mêtinkarî, faşizm bes bi wekî polîtikaya dewletê nayê ravekirin, ev yek bi wekî rewşeka derûnî û hişmendiyeke kokdar ji nav girseya Tirk de her heye.
Wekî nimûne, gelek caran tê gotin ku dewlet faşîst e an jî siyaseta dewletê êdî bêtirîn ber bi faşîzmê ve diçe lê belê kesek nabêje ku faşîzm bi wekî rihekî, sekneka girseyî ji nav vê civakê de kokdar e. Bêguman ji civaka Tirkan de taybetmendiyeke faşîst her hebû.

Ev rihê faşizan ji salên 90î pê de lap bi awayekî militanî şêwaz girtibû, te digo qey derketiye li sûkê ji xwedîyên xwe digeriya.
Ew rewşa derûnî ya ku di salên 90î de sûk dagir kiribû, dagirkerî, mêtinkarî û faşîzm bi wekî teybetmendiyên xwe didît û bi vê şanaz dibû, veca 15ê Tirmehê de derket li sûkan, serî qut kir, mirov linç kir û çi derkeve li pêşiya wan tune kir.
Ev rihê faşîzan, ev rewşa derûnî ya kokdar gengaz dike ku komek xwendekarên Tirk dagirkirina Efrînê bi belavkirina loqiman ve pîroz bikin.
Dagirkirina Efrînê ji bona Tirkan xaleka werçerxê ye. Lewre Erdoxan li hemberî hewlên "ewan" hîç tehemûl nake. Jixwe bi vê sedemê hevalên ku li zanîngeha Boxazîçîyê kirin ku wan ên dagira Efrînê pîroz dikin asteng bikin bi aliyê Erdoxan xwe ve bi wekî "terorîst" hatin pênasekirin û Erdoxan zûtirkê peywîr da dadgehên xwe ku ev hevalan bên girtin.
Belê, Efrîn ji bona Tirkan xaleke werçerxê ye. Bi qewla Erdoxan ve "vejînê dest pê kiriye!"
Erdoxan bi awayekî eşkere dibê ku Efrîn ji bona dahatûya Tirkbûnê mijareke hebûn nebûnê ye. Bi van sedeman banga hevalên ji zanîngeha Boxazîçîyê gelekî girîng e ku van hevalan di van rojên gelemperîya mirovan ketine di bin bandora tirseka kûr de bi dirûşma ku dibê "loqimên (pîrozbahiya) dagirkerî, tevkujîyê nabe!" ve li hemberî vê bêndengiya rezîl serî hildan. Wateya vê bangewazîyê pir girîng û gewre ye.
Gewrebûna vê bangewaziyê tirs kire ji dilê Erdoxan.
Wekî ku şerê emperyalîst î yekemîn ji nû ve dest pê kiribû heya ku "sosyalîstên" Almanan li meclîsê de raya xwe ji bona erêkirina bûtçeya şêr a Almanyayê didan, Karl Lîebknecht bi tenê serê xwe li hemberî her kesî ew meclîs terk kir. Wateya vê kirina Karl Lîebnecht çi be, wateya bangawaziya hevalên me jî ew e.
Wekî ku 18 sibatê sala 1943'yan de dema ku Nazîyan dinya dabûn li ber gef gura xwe, werankarî dikirin, Sophie Schol û hevalên wê li zanîngeha Munîhê bi bangewaziya xwe bandora tirsê şkestandibûn, hevalên me jî li zanîngeha Boxazîçîyê heman yek kirin.
Wekî ku Mazlûm Doxan û rêhevalên wî li zindana Amedê de desthilatdariya tirsê şkestandin û bi bilindkirina dengê xwe serdemeka nû dan dest pêkirin, bangewaziya hevalên me jî bi heman sedemê girîng e.
Sedema ku vê bangewaziyê bi wekî nimûneyên me dabûn girîng dike ew e ku van hevalnan di vê serdema ku bêdengî bi wekî rêgezekî hatiye pêjirandin, li ber desthilatdariya tirsê her kesî xwe kerr û lal kiriye de van hevalan bi wêrekî gotine ku "ez li vir im, li hemberî zilmê disekinim!" Jixwe a ku Erdoxan jê ditirse jî ev yek e.
Erdoxan û pergala ku bi hebûna Erdoxan ve dirûv girtiye baş dizane ku heke li zanîngeha Boxazîçîyê, bi wekî navenda mêtinkariyê li Stenbolê ev bangewaziya mezintir bibe, ew tişka ku em jê re dibên "serhildan" ew e koka Erdoxan jî vê pergalê jî bibîne.
Divê em ji vê bangewaziyê xwedî derkevin û wê bilintir bikin. Erdoxan çi qasî bike ku bibiryarî vê bangewaziyê bifetisîne divê em jî bi heman biryardariyê vê bangewaziyê bilinditir bikin. A ku Tirkbûnê ji agirê wê xwe de bişewitîne ev bangewazî ye ku li navenda Tirkbûnê de hatiye bilindkirin. Vê bangewaziyê bilindtir bike! Ji hevalên ev wêrekîya kirina xwedî derkeve!

**Di Derheqa Wateya Efrînê de**

Komara Tirkan her çi qasî di sala 1923'yan de hatibe avakirin jî pergaleke bicihbûyî, kokdar nîn e.
Jixwe ne gengaz e ku wiha be. Heya ku komara Fransizan xwe birêxistin û pergalî kir herî kêm sê "şoreş" bi qasî wê jî "dij-şoreş" derketibûn li holê.
Heman yek ji bona komara Almanan jî wiha bû. Heya ku komara Almanan lap bicihbû serhildanên şoreşgerî yên di salên 1848, 1918, 1923'an li pey hevdû derketin holê û helbet li hemberî her yek vê şoreşê derbeyên dij-şoreşgerî hatin kirin û piştî serdema Nazîyan (vê serdemê 12 salan berdevam
kir) û her du şerên cihanê hatin û derbas bûn. Belê avakirina komara Tirkan di sala 1923'yan de hatibû îlankirin bes ev îlaneke li ser kîxazê bû.
Taybetmendiyeke komara Tirkan jî ew bû ku li ser xakeka hatiye dagirkirin xwe ava kiribû û heya neteweyeka mêtingeh jî bi wekî tebaayê/rajêrîyê xwe îlan kiribû. Jixwe piştî demeke kurt serhildanên Kurdan bingeha komara Tirkan ji cih leqandin.
Di dawiya salên 1930yî de serhildanên Kurdan bi gelemperî hatibûn fetisandin, dewleta Tirkan bêyî herema Dêrsimê desthilatdariya xwe li ser

hemû xaka ku bi wekî "Misak-î Millî" bi nav dikin saz kiribû. Komara Tirkan hê bicihbûyî nîn bû û kontrolkirina xaka Dêrsimê ji bûna bicihbûna pergala komarê wekî asteke girîng dihate qebulkirin. Heya ku ev yek wekî şerteke sereke didîtin. Şert û mercên ku Dêrsimê dagir bikin di sala 1938'an de pêk hatin.
Wekî sala 1915'an sala 1938'an jî bi şert û mercên dîrokî û konjekturel salên taybet in, xwedîyên taybetmendiyên cuda nin. Sala 1938'an erefeya Şerê Emperyalîst ê Duyemîn e. Her çi qasî Şerê Emperyalîst ê Duyemîn nehatibe îlankirin jî bi awayekî fîîlî dest pêkiribû. Japonyayê dest bi dagirkirina Çîn û Moxolîstanê kiribû, Almanyayê Avusturya dagir kiribû, li Îspanyayê şerê navxweyî berdevam dikir. Yanê hemû dewletên desthilatdar "serhilderên nav tixûbên xwe" ji holê ra dikirin û desthilatdariya xwe qewîntir dikirin.
Dema ku dewleta Tirkan di sala 1938'an de êrişî Dêrsimê kir hal û ehwalê dinyayê wiha bû. Dêrsim ji nû ve hate dagirkirin, lê belê vê yekê têr nekir ku komara Tirkan pergela xwe bicih bike. Jixwe li hemberî hemû zilm û zordariyê xezebeka mezin derdiket ji holê.
Ev xezeba di sala 1984'an de bi êrîşên Şemzînan û Erûhê ve bi wekî hêzeke rêxistinkirî derket li ser dîka dîrokê.
Nêzîkî 100 salinan e ev xezeba hê jî mezintir bû û pêl bi pêl berbelavtir bû.
Lewma jî xwedîyên komarê tirsiyan û dest bi nîqaşên wekî ku "dibe ku divê em vê komarê cardin nîqaş bikin (mabesta wan ew e ku Kurdan jî bi awayekî midaxilî komarê bikin)" kirin.

**Û Efrîn...**

Efrîn bes bajarek an jî bajereke Kurdan nîn e. Di navbera Kurdan û komara Tirkan de rikeberiyeke herî kêm sed salî heye û Efrîn jî vê rikeberiyê de asteke nû û dawîn e.
Wekî ku tê zanîn li xeta Suriyê, Iraq û Kurdistanê de 7 salin ku pevçûnek didome.
Li gorî plana dewleta Tirkan li Misrê Birayên Misilman, li Tunsê Natha û li Suriyê jî tevgereka wekî Birayên Misilman dê desthilatdarî bi dest bixista.
Tirkiye yê jî xwe bi wekî serokê vê cepheyê îlan bikira ku piyê Îranê li heremê bişimitîne û bibe xwediyê desthilatdariyeke mezin.
Li gorî vê Tirkîye yê bazara xwe mezintir bikira û Daîş jî pêşiyê ji bona tirsandin û terorîzekirina gelê heremê palpişt bikira lê piştî sazkirina desthilardariyê yê serê Daîşê biperçiqanda, bikira ji destê xwe. Lê belê ev plan li Misirê hate betalkirin, Amerîkayê bi derbeyeke rêxistina Cihadî ya ku jê re dibên Birayên Misilman têk bir. Wekî vê Amerîkayê ji hêzên wekî Îran, Rusya û Kurd ve peymanên nû danîn û vê yekê jî plana Tirkîyê lap boş û betal kir.
Dewleta Tirkan li hemû cepheyan têk çû û xwe avêt ji bextê hêzên paramîlîter ên bi wekî Daîş, Arteşa Azad a Suriyê ku li heremê bikaribe hereket bike. Ji vê astê şûnve jî dewleta Tirkan qîlên xwe li hemberî destketiyên Kurdan tûjtir kirin. Piştî ku dewleta Tirkan êdî baş têgihîşt ku nikare xwe li heremê wekî hêzeke emperyal birêxistin bike, ji bona ku bikaribe hebûna dewleta burjuva a Tirkan bidomîne li hemberî Kurdan şerekî nû da dest pêkirine.
Tirkan dît ku heke hesawê xwe ji Kurdan re negirin nikarin ku bingeha komara xwe ya 1938'an de hatibû avakirin saxlemtir bikin. Lewma jî biryar dan û êrîşeke nû û mezintir ve Kurdan têk bibin.
Konjoktura heyî heyama 1938'an tîne ji bîr ku Şerê Emperyalîst ê Duyemîn dest pê dikir, çawirdora dinayayê bi toz û duxana şêr ve girtîbû. Û Tirk dixwazin kirûyên xwe yên sala 1938'an de li Dêrsimê kiribûn niha jî li Kurdistanê bikin.
Tirk dixwazin ku rikeberiya sedsalî ya di navbera xwe û Kurdan de bi têkbirina Kurdan ve dawî bikin. Efrîn bi tenê destpêkeke nû ye. Dewleta Tirkan dixwaze bi dîtina bahaneyên nû ve lîstika xwe ya li ser Efrînê, li her dera Kurdistanê heya li Qendîlê jî bilîze.
Analîst dibêjin ku "şerê li Suriyê berî deh salan naqede."
Bona Kurdan û Tirkan wateya vê gotinê ew e ku vê pêjoya deh salî de dewleta Tirkan yê bike ku dinamik/felîta Kurdan bilîze ku bingeha komara xwe saxlemtir bike. An felîta Kurdan yê wisa bike ku komara Tirkan lap bi bineha xwe ve bi cihê xwe bileqe û hilweş e. An jî yê komara Tirkan de veguherineke binyadî pêk bibînin, ne li gorî hêmanên Tirkbûnê lê li gorî hêmanên "hemwelatiya makzagonî" komareke burjuva saz bikin. Yek tişta misoger heye ku êdî tu tişt wekî berê nabe.

# Bi wesîleya Salvegera Sed û Heftêmîn a Marksîzmê ve Hin Nîşe

Alaz Arazyan

**Destpêk:**




"Li Avrupayê xeyaletek/reşeyek digere- reşeyê komûnîzmê. Hemû hêzên qedîm ên Avrupayê li hemberî vê xeyaletê hevkariyê dikin ku bi vê nêçîra pîroz ve xeyaletê def bikin. Papa û Çar, Metternîch û Guîzot, Radîkalên Fransiz û polîsên Alman ku van hemûyan bona yek armancê mildane hevdu." Sed û heftê salan berê Marks û Engels bi van gotinan ve dest bi nivîsa Manîfestoya Komûnîst kirîbûn. Û di vê navberê de sed û heftê sal derbas bûn. Helbet vê pêvajoyê de gelek tişt qewimîn, zemên gelek tişt guhertin. Hin salên wisa hatin ku ji bona armancên Manîfestoya Komûnîst de hatibûn îlankirin bi milyonan meriv derketin li sûkan, barîkatên xwe ava kirin û şer kirin, gelek ji van kesan hatin kuştin, hatin hepskirin. Û helbet hin kes li ser navê bîrdozên di Manîfestoya Komûnîst de hatine îlankirin li ser nîvekî rûyê dinyayê bûn desthilatdar.
Demeka wisa hat ku desthilatdaran ne bi tenê serkeftina xwe, dawîya dîrokê jî îlan kirin. Hêbêtir, zêdepariya çîna bindest jî baweriya xwe bi vê eletewşîyê anî. Digel hemû pêşveçûn û paşveçûnên berxwedana çînî, Komûnîst Manîfesto him ji bona çîna karkeran him jî ji bona komûnîstan xwedîyê girîngiyeke dîrokî û rojane ye. Ev yek berê jî wiha bû, hê jî neguhiriye. Belê, Komûnîst Manîfesto ji bona burjuvazî û çîna karkeran hê jî zehf girîng e lê yên ku divê rexneya Manîfestoya Komûnîst bikin komûnîst xwe nin.
Ev yek peywîra komûnîstan e. Çimkî peywîra komûnîstan ne bi tenê bi cih anîna bîrdozên Manîfestoya Komûnîst e, di heman demê de yên ku divê van bîrdozan pêşdetir bibin, çêtir bikin jî bi wekî mîratgirên Manîfestoya Komûnîst, komûnîst xwe nin.

Em bi wekî komûnîstên li pişta Bingeha Komûnîst (bi Tirkî, Komünist Zemin) disekinin, sed û heftêmîna salvegera Manîfestoya Komûnîst de rasterast dibêjin: peywîra me ew e ku em bi şêwaza rexengirîyeke şoreşger ve rexneya Manîfestoya Komûnîst, nivîskarên Manîfestoya
Komûnîst yanê avakerên Komûzmê bikin. Lewre ji bona ku hişmendiya komûnîzmê bê perisandin, em xwe jî bikaribin wateya komûnîstbûnê ya rast fêm bikin û li gorî şêwazeke komûnîst li ser jiyanê bandor bikin divê ev yek bê kirin.

### A ku ji Manîfestoya Komûnîstê ve Heya Roja Niha di Marksîzmê de Hîç Neguhirîyê Çi ye?

Hin taybetmendiyên heya niha di Manîfestoya Komûnîst de hîç neguhirîne, wekî nîşaneyên rihê Manîfestoya Komûnîst mane henin. Meriv dikare van taybetmendiyan bi wekî çend sernivîsan bi kurtasî rave bike.

1) Têgihîştina dîrokê ya materyalîstî;

2) Nirxandina Kapîtalîzmê;

3) Destnîşana dibêje ku "pêşveçûna kapîtalîzmê ya navneteweyî taybetmendiya şoreşa proleter bi sêrî de diyar dike."

4) Destnîşana dibêje ku kapîtalîzm xwe bi wekî împaratoriya dinyayê birêxistin dike lê di heman layê de "çîna ku gora kapîtalîzmê dikole" jî bi destên xwe diafirîne;

5) Nirxandina nakokîyên civata burjuva;

6) Destnîşana dibêje ku "Divê çîna karkeran ji bona veguherîna sosyalîst a civakê desthilatdariyê bi awayekî wisa zeft bikin ku di pêvajoya avakirina pergaleke nû de hemû astengên polîtîk bi hêsayî bên tunekirin."

7) Destnîşana dibê ku "Komûnîst encax dikarin daxwazên xwe bi helweşandina şert û mercên civakî ve pêk bibînin"

8) Destnîşana dibêje ku "Birêxistinkirina proleteran a çînî di esasê xwe de birêxistinkirina partiyeke polîtîk e."

9) Destnîşana dibêje ku rêvebirîya dewleta modern, komîteyeke hevpar e ku hemû karên çîna burjuva bi rêve dibe.

10) Destnîşana dibêje ku "dîroka hemû civakên heya roja niha heyî, dîroka berxwedana çînî ye."

11) Di dawiya dawiyê de ûtopya ew e ku civakeke xwe bi bingeha wekhevî û piştgirîyê ve rêxistinkirî bê sazkirin.

Ev her deh xalên me li jorê bi kurtasî nivîsîn bi esasî nîşaneyên rihê Manîfestoya Komûnîst û Marksîzmê nin ku ev riha hê jî zindî ye. Ev taybetmendî bi wekî sed û heftê sal berê hê jî rast û bibandorkar in.
Heya ku têgihîştina komûnîst û kiryarên Marksîst sedemên hebûna xwe bidomînin, ev taybetmendiyên ku rihên Manîfestoya Komûnîst û Marksîzmê pêk tînin jî yê derbasdarbûna xwe bidomînin.

**Taybetmendiyên Manîfestoya Komûnîst û Marksîzmê yên Divê Bên Perisandin Çi Nin?**

Meriv dikare van taybetmendiyên di Manîfestoya Komûnîst de cih girtine û bi wekî hêmanên marksîzmê tên qebulkirin ên ku divê bên perisandin/pêşxistin wiha rave bike;

1)Di Manîfestoya Komûnîst û marksîzmê de rê û rêbazên ku divê civak bigirin bi têgihîna peresanparêz vê hatine ravekirin. Her çi qasî têgihîna dîrokê ya nivîskarên Manîfestoya Komûnîst materyalist be jî, ev nivîskaran dema rê û rêbazên ku divê civak hilbijêrin rave dikin şêwazeke peresenparêz bi kar tînin. Lewre jî li gorî van nivîskaran bona ku civakek şarezatir bibe divê pêşîyê Avrupî bibe, yanê li gorî vê gotinê civakên ne Avrupî ne "şaristanî" nin û divê pêşiyê vê pirsgirêkê çareser bikin. Dîrok û bûyerên berxwedana civakî baş nîşan daye ku şaşiya têgihîna peresenparêz bi aliyê dînamîzmê nanokîyên civakî û çînî ve ji zû ve hatiye eyankirin. Têgihîna peresenparêz ji nav jiyanê de bi gelek caran hatiye mehkumkirin û şaşiya vê tegihînê gelek caran hatiye îzbatkirin. Divê ev têgihîna peresenparêz û rojavayî bi aliyê tevgera komûnîst ve jî neyê qebulkirin.

2)Nivîskarên Manîfestoya Komûnîst li hemberî guncanîya burjuvazîyê, bi taybetî guncanîya şaristanîya burjuvayî ya ku xwedîyê derfeta şaristanîkirina "hemû neteweyan e, heya ku "ên herî hovtirîn" jî heyran hejmekar mane. Bi heman sedemê bi wekî çîneke talankar û mêtinkar çîna brujuva bi wekî projeyeka "şaristanîyê" pênase dikin. Bi heman sedemê ye ku nivîskarên Manîfestoya Komûnîst dema Îngîlîzîstan Hîndîstanê dikê mêtingeha xwe, vê bûyerê bi wekî kiryareke "şaristanîkirinê" dibînin û silav dikin.
Ev nêrîna berhemeke taybetmendiyên Marksîzmê yên "pêşketinxwazî" û rojavanavendîyê ye ku ev sedemên gunehkarbûna Marksîzmê nin.
Divê berdela vî gunehkariya Marksîzmê bi aliyê tevgera komûnîst ve be dayin û Marksîzm ji vê nanokiyê bê rizgarkirin.

3)Şaristaniya çîna burjuva alafên hilberînê pêşde birin û lewre "hêzên sirûştê ketin di bin kontrola mirovan" û nivîskarên Manîfestoya Komûnîst ev yek wekî "pêşverûtî" pênase kirine. Vê "pêşveçûna" çîna burjuva rê da ku "parzemînên gewre ji bona cotkariyê bên terxan kirin" û helbet nivîskarên Manîfestoya

Komûnîst ev yek jî wekî bûyereke erênî silav kirine.

Ev têgihîn, wekî ku me li jorê jî rave kiribû, encama têgihîna dîrokê ya "pêşketinxwaz/ilerlemeci-progressive" e ku Marksîzm heya niha tu carî di bin bandora vê têgihînê derneketiye lê divê ji zûtirkê xwe ji vê têgihînê rizgar bike.

4)Kêmasîyeke nivîskarên Manîfestoya Komûnîst jî ew e ku van kesana fêmdariya xwe ji têgihîna dîrokê ya pêşketinxwaz xelas nekirine lewre jî wisa difikirin ku ji nav demê de bi awayekî bêhemdî xwe her tişt dê biguhere û ber bi erêniyê ve biçe.

Michael Löwy vê têgihîna di bin bandora "pêxketinxwazî/progressive" de wiha rave dike:

"Marks û Engels di bin bandora îdeolojîya pêşketinxwaz a ku hêvî dike ku her tişt bêhemdî xwe bi awayekî erênî biguherin de ma bûn. Loma jî bi awayekî xwerazî îlan kirin ku têkçûna çûna burjuva û serkeftîna çîna karkeran du bûyerên bi qasî hevdu misoger in. Zêde hewce nîn e ku meriv li ser bandora têgihîneke dîrokê bi wekî pêvajoyeke encamên wê bi aliyê hêmanên dîrokî an jî nanokîkiyên pergalê ve bên diyarkirin bisekine. Heke meriv li gorî encamên mantiqî ên têgihîneke wiha bifikire –helbet nivîskarên Manîfestoya Komûnîst ev yek wiha nekir- hîç hewceya hişmendiya şoreşgerîyê, birêxistinkirinê, bîrdozîyê yanê hêmanên wiha taybet nedibû. Wekî ku Plekhanov jî gotibû: heke "serkeftina bernameyê wekî ku sibê dema beyaniyê de roj ji nû ve hil bê misoger be" çi hewce heye ku partiyeke siyasî bê avakirin, bes ji bona nav û naşê meriv derkevin li qada şêr û canê xwe ji dest bidin? Hîç kes nîn e ku bona sibê dema beyaniyê de tav ji nû ve hil bê rêxistinekî ava bike."
(Michael Löwy: Globalîzm û Navnetewetî)

Li hemberî vê têgihîna peresanparêz (evolutionalist/evrimci) piştî nîv sedsalî hin rexneyên mafdar hatin kirin. Meriv dikare van rexneyên li hemberî nivîskarên Manîfestoya Komûnîst di têgihîna Troçkî ya "Şoreşa berdevamî" (Permanent Revolution/Sürekli Devrim) de, di broşûra ku Rosa Luxemburgê di sala 1915'an de bi navê "Broşûra Junîusê" ve nivisîbû de, di nivîsên Lenîn ên piştî sala 1917'an de, di nivîsên Walter Benjamîn de bibîne. Van marksîstên ku me li jorê navên wan kiribûn li hemberî têgihîna nivîskarên Manîfestoya Komûnîst rexneyên xwe kirine lê helbet nav komûnîstan ev rexneyên xwe yên girîng wekî ku bi awayekî fikrî ji nivîskarên Manîfestoya Komûnîst veqetiyabin rave nekirin. Lê belê van rexneyên wan bûn sedem ku ev kêmasîya nivîskarên Manîfestoya Komûnîst bên fêmkirin û ev yek jî pir girîng e. Şoreşa Cotmehê a 1917'an li hemberî Manîfestoya Komûnîst bi awayekî şoreşgerî tev geriya, nivîskarên ku me li jorê qala rexneyên wan kiribû jî li hemberî nivîskarên Manîfestoya Komûnîst û têgihîna dîrokê ya peresanparêz bûn.

5)Kêmasî an jî şaşîyeke din a nivîskarên Manîfestoya Komunîst jî di derheqa Malbatê û Rewşa Jinan a Civakî de ye. Li gorî fikra nivîskarên Manîfestoya Komûnîst jixwe çîna burjuva bêhemdî xwe saziya malbatbûnê tasfiye dike û piştî ku çîna burjuva têk çû ev sazîya yê ji holê ra be.

Di beşa Manîfestoya Komûnîst a bi navê "Proleter û Komûnist" de ev mijara wiha tê ravekirin:

"Malbata vê serdemê, malbata burjuva xwe dispêre kîjan bingehê? Bersîva vê pirse sermayedarî û milkê taybet e. Bingeha sazîya malbatbûnê a bujuva bi tevahî ev e. Lê belê a ku niha di navbera proloteran wiha nîn e yanê li gorî vê rewşa di navbera çîna proloter nebûna malbatê û fuhuşa eşkere ye."

Wekî vê beşa me li jorê nivisî de tê dîtin nivîskarên Manîfestoya Komûnîst malbatbûn wekî taybetmendiyeke sermayedariya taybet pênase kirine; hebûna malbatê û hêmanên sazîya malbatbûnê bi hebûna sermayedariya taybet ve rave kirine. Lê jiyanê bi awayekî eşkere derxistiye mederê ku him çîna burjuva saziya malbatbûnê tasfîyê nake bes li gorî xwe diguherîne him jî di rewşên ku sermayeya çîna burjuva ji destê wan hatibe girtin jî sazîya malbatbûnê hebûna xwe didomîne. Bona ku meriv vê yekê fêm bike bes e ku meriv li erdnigariya Şoreşa Cotmehê lê pêk hatibû binêr e. Di YKSS'yê (Yekitiya Komarên Sosyalîst yên Sovyetê) de desthilatdariya sermayedariya taybet hate kutakirin lê hebûna mal-

batê, têkiliyên malbatî û di dabeşkirina karan de zayendperestîyê berdevam kiriye. Wekî vê li gorî fikra nivîskarên Manîfestoya Komûnîst piştî ku jin tevli hilberîna civakî bûn êdî ew bûn xwediyê azadiya aborîyê û vê yekê jî bingeha desthilatdariya mêrane ji holê ra kir. Gerçî ev mijara di Manîfestoya Komûnîst de ev qasî eşkere nayê ravekirin lê 36 salan şûnda dema Engels pirtûkekî bi navê "Jêderka/koka Malbatê, Sermayedariya Taybet û Dewletê" ve dinivîse û di vê pirtûkê de ev mijara bi tevahî wiha tê ravekirin. Mixabin nivîskarên Manîfestoya Komûnîst ev mijara jî şaş rave kirine. Sedema vê şaşîyê ew e ku desthilatdariya mêran bi serdestîya aborî a mêran ve rave kirine. Dema ku marksîzm hewl dide ku her tiştî vê sermayedariyê ve rave bike pirsgirêkên wiha derdikevin, ji ber ku bêyî sedemên aborî helbet sedemên din jî henin. Piştî van gotinan jin tevli hilberîna civakî bûn lê ne vê yekê saziya malbatbûnê hilweşand ne jî wekhevitîya jin û mêran saz bû.

6)Pirsgirêkeke Manîfestoya Komûnîst a din jî mijara neteweyî ye. Dema ku kapîtalîzm Asya, Afrîka û Başûrê Amerîkayê zevt dike nivîskarên Manîfestoya Komûnîst vê yekê wiha rave dikin ku dewletên "paşdemayî, hovane" tên şaristanîkirin. Sedema vê yekê jî ew e ku nivîskarên Manîfestoya Komûnîst kapîtalîzmê wekî pêvajoyeke berîya ku mirovahî xwe bigihênîn sosyalîzmê pênase dikirin. Lewra jî tu girîngî nedan felîta şoreşgerî a ku rêxistinên li dewletên mêtingeh an jî nîv-mêtingeh heya ku ji dewsa van tevgerên serxwebûnparêz alîgiriya mêtinkaran kirin.

7)Şaşîyeke nivîskarên Manîfestoya Komûnîst jî ew e ku dibêjin "kapîtalîzm şert û mercên jiyana çîna karkeran xerbatir dike û heya ku çîna karkeran xizantir dike." Lê pêvajoyê nîşan da ku ev gotina ji bona hemû çîna karkeran wiha nîn e. Îro li Avrûpayê her karker salê herî kêm 30.000 € dirav qezenç dike lê karkerekî Afrîkayî dikare encax 100 € bi dest bixe. Dema meriv van rastiyan li hemberî hevdu dike bi awayekî eşkere derdikeve holê ku gotinên nivîskarên Manîfestoya Komûnîst ji bona hemû karkeran ne rast e.

8)Xaleka girîng a ku bi aliyê nivîsakarên Manîfestoya Komûnîst ve nehatibû dîtin jî ew e ku kapîtalîzm xwedîyê wê potansîyelê ye ku xwe ji nû ve hilberîne. Nivîskarên Manîfestoya Komûnîst û avakerên marksîzmê serdemeka dibe ku wekî berbanga kapîtalîzmê bê qebulkirin wekî ku serdema genîbûna kapîtalîzmê îlan kirine û tivancên kapîtalîzmê yên zayînê jî bi wekî hewarên kapîtalîzmê yên mirinê dîtine. Mixabin heman şaşîtiyê hebûna xwe di nav nifşên nû yên marksîst de berdevam kiriye, marksîstên nû jî wekî yên avaker hema her krîza kapîtalîzmê wekî "hewara dawîn a mirina kapîtalîzmê" îlan kirine. Lê belê kriz jî hêmaneke hebûna kapîtalîzmê ye. Kapîtalîzm bes bi rêya van krîzan dikare xwe ji nû ve ava bike û hilberîne. Ev krîz kêrî kapîtalîzmê tên ku kapîtalîzm xwe ji nû ve hilberîne û sermayeyê navenditî bike loma jî divê ev krîz wekî ku hewara kapîtalîzmê ya pêşîya mirinê neyên pênasekirin. Têgihîna krîzê ya komûnîstan ew e ku krîz rasterast rewşeke şoreşgerî derxe li holê. Krîzên ku xwedîyê wê potansîyelê nin ku kapîtalîzmê hilweşînin ev in. Bêyî vê krîzên din bes kêrî kapîtalîzmê tên ku kapîtalîzm xwe ji nû ve hilberîne. Jixwe di dîrokê de jî ev yek tim wiha bû.

9) Pirsgirêkeke nivîskarên Manîfestoya Komûnîst a din jî ew e ku dibêjin "li hemberî partîyên din ên karkeran komûnîst jî bi tena serê xwe partiyeke taybet nîn in. Bêyî berjewendiyên hemû proletaryayan ti berjewendiyên komûnîstan ên cuda nîn in. Bona ku şêwazê bidin tevgera proloterya rêgezên taybet çê nakin."
Ev helwesta gelekî şaş e û dawîya dawîyê de rê nade ku komûnîst serwêrîyê bikin heya wan dike pey boçika girseyan. Berîya her tiştî divê bê zanîn ku proloterya yekpare nîn e lewma jî bertekên hevdugirtî nîşan nade. Heya ku gelek caran ji nav xwe de dijbertiya hevdu dike. Lewma jî bes komûnîst yanê partîyên komûnîstan dikarin nûneriya berjewendiyên hevpar ên hemû proloteryayên dinyayê bikin. Jixwe bona vê sedemê ye ku komûnîst partîyan ava dikin. Heke wiha ne bûya hewce çê ne dibû ku komûnîst bi tena serê xwe partiyan ava bikin, wan jî dikaribû tevlî rêxistinên karkeran, sendîkayan, partîyên karkeran ên klasîk bibûna û bi xebatên xwe ve xizmeta çîna karkeran bikirana. Lê peywîra komûnîstan ne bes xizmetkirina çîna karkeran e ne jî tek pirsgirêka komûnîstan parastina berjewendiyên çîna karkeran e. Tesewireke komûnîstan a avakirina jiyaneke nû heye û çîna karkeran jî tekane kir-

deya vê tesewirê ye. Lê heman tesewira proloteryayê nîn e. Çîna karkeran bi tena serê xwe xwedîyê tesewireke ku jiyaneke nû ava bike nîn e. Armanca çîna karkeran a serkeke ew e ku rewşa aborî û şert û mercên jiyanê bên çêtirkirin. Lewma jî asoya çîna karkeran û asoya komûnîstan hevpar nîn e.

10) Pirsgirêkek nivîskarên Manîfestoya Komûnîst ew e ku dibêjin "heke dema betal/vala a çîna karkeran zêde bibe û aborîya wan çêtir bibe ew ê van derfetan bona ku hişmendiya çînî bêtir fêm bikin û rêxistin bikin bi kar bînin."
Li hemberî vê destnîşanê du îtîrazên me yên sereke henin.
A yekemîn; mixabin pratîka jiyanê rewşeke berevajî vê destnîşanê ji me nîşan daye. Gava ku em li welatên rewşa çîna karkeran çêtir bûye dinêrin xuya dibe ku çîna karkeran a li van deran wekî çirxatekî ketiye pêşîya şoreşa proloteryaya dinyayê û tevgerê heyî jî berasteng dike. Karkerên rewşa wan a aborî çêtir bûye êdî wekî mile bûrjuvazîyê yî di nav çîna karkeran de kar dike.
A duyemîn; ev helwesteke ekonomîst e. Di bin desthilatdariya kapîtalîzmê de hişmendî û çanda çîna karkeran jî bi aliyê kapîtalîzmê ve tê afirandin. Bi vê çand û hişmendiya desthilatdar ve, di bin desthilatdariya kapîtalîzmê de çêtirkirina rewşa aborî a çîna karkeran rê dide ku çîna karkeran parçeyekî destketiyên burjuvaziyê bikin para xwe û pergala kapîtalîst ji nû ve berbelav bikin. Yanê çîna karkeran jî tevli mezaxtina çaxkanîyên dinyayê dibin, zêdetir û zêdetir girêdayî vê çerxê dibin. Dema ku meriv ji çîna karkeran a welatên rojavayî dinêr ê; bi rastî ji dema xwe ya betal de xêncî mezaxtin, gerr û sefayê tiştekî din nakin.
Vê helwesta Manîfestoya Komûnîst destûr daye ku di çanda şoreşger de helwesteke ekonomîst lewre jî reformîst bicih bibe. Bi heman sedemê ye ku zêdepariya tevgera şoreşger xwe bes bi daxwazên wekî mûçe, mafên karkeran ve mijul kirine û lewre jî ketine nav keraseta sendîkalîzmê.

11) Pirsgirêkeke nivîskarên Manîfestoya Komûnîst jî ew e ku tesewira wan a dahatûyê mirovperest e. Ev hêmana bi taybetî Marksîzmê dike xizanê dînên yekxwedayî ên ku bandora xwe li ser 2500 salên dawîn kirine. Wekî tê zanîn anegorî dînên yekxweda mirov afirîdeya herî girîng e û xwedê hemû gerdûn û afirîdeyên din bes ji bona mirovan afirandine. Yanê meriv dikare bibêje ku mirov sîya xwedê ya li ser rûyê dinyayê, şahê hemû zindîyên din e. Mixabin damezrênerên Marksîzmê jî wekî dînên semawî mirov pîroz kirine û hemû tewsîra dahatûyê li gorî berjewendî û dilxweşîya mirovan çê kirine. Ev nijadperestiyeke mirov-navendî ye. Li gorî tesewira marksîzme mirov desthilatdarê her tiştê din e. Jixwe bi heman sedemê ye ku nivîskarên Manîfestoya Komûnîst bê şert û merc piştgirî dane pêşveçûna endustrî û teknîkê lê hîç nekirine xem bê gelo ev pêşveçûn li ser sirûştê çawa bandor dike û koka kîjan zindîyan tîne.
Damêzrenên marksîzmê vê mijarê de ew qasî xwerazî bûn ku heya Engels pênasîna azadiyê wiha dikir, "dîlgirtin û hukimkirina sirûştê." Pêvajoya heyî de êdî mirov hema hema dikare li ser sirûştê serwêrîyê bike û encamên vê yekê jî li mederê nin; hindik maye ku sirûşt tevde tune bibe.
Êdî diyar e ku çu pêşeroja teswirên dahadûyê ên mirovperest nîn in. Heya ku heke ev tesewira mirovperest a damezrênêren marksîzmê pêkan bibe jî divê bê redkirin. Dawiya dawiyê de mirov jî wekî zindîyên din parçeyekî sirûştê ye û ne li ser zindîyên din re ye ne jî tu serwêrîya mirovan li ser sirûştê û zindîyên din heye. Lewma jî divê tesewira dahatûyê a marksîztên vê serdemê mirovnavendî nîn be, bingeha xwe bi sirûştê bigire.

## Dewsa Encamê

Divê komûnîstênmji rihê şoreşger ê Manîfestoya Komûnîst xwedî derdikevin û ên xwe wekî mîratgirên Manîfestoya Komûnîst îlan dikin him wekî encameke materyalîzma dîyalektîk a ku bingeha marksîzmê pêk tîne him jî wekî pêwîstiyeke teorîya şoreşgerî digel nivîskarên Manîfestoya Komûnîst, Manîsfestoya Komûnîst li ser bingeha ew heq dike cardin ra bikin li ser stûnên wê xwe.
Heke ku ev yek neyê kirin û li ser navê dilsozîkirina nivîskarên Manîfestoya Komûnîst pirsgirêkên heyî bên pîrozkirin, marksîzm nikare xwe ji vê deqmeya zaroktiyê ya 170 salî rizgar bike û li hemberî pratîka jiyanê ya dijwar nikare teyax bide.
Di vê rewşê de berpirsiyarên vê kerasetê nivîskarên Manîfestoya Komûnîst nîn in, komûnîstên vê serdemê nin.

# Bona Her Nîjadkujîyê Yek Cejn!

**Kevî Lerzan**




Bona Tirkan wateya 19'ê Gulanê "cejna bi bibîranîna Atatirk, Ciwanî û Werzîşê" ye. Ev "cejna" di sala 1935'an de bi aliyê klûbê werzîşê yî bi rastî jî wekî "şoreşger" tê zanîn, Bêşîktaşê vê hatiye pêşniyarkirin.
Dîsa heman klûbê werzişê bona ku 19yê Gulanê wekî cejneka fermî bê qebulkirin serî li Enqerê didin. Ev daxwaza wekî pêşniyariyeke dadî diçe li ber Atatirk û bi pejirandina Atatirk ve wekî zagon tê qebulkirin. Ji sala 1938'an pê ve êdî wekî "Cejna Ciwanî û Werzîşê" tê pîrozkirin.
Li gorî dîroka fermî a Tirkan 19 Gulana sala 1991'an de Atatirk bêyî destûra hikûmeta Stenbolê tê li Samsunê û "Berxwedana Neteweyî" dide destpêkirin. Lê belê Mistefa Kemal û endamên din ên girêdayî koma İttihatê bi fermana Şah Vahdettin ve çûn li Samsunê û heya maeşê xwe jî ji Serayê digirtin.
Armanca hikûmeta Stenbolê ew e ku li ser xaka ew wekî "Anatolya" bi nav dikin û wekî mîrateya Osmaniyê dibînin cardin desthilatdariya xwe saz bikin. Bona ku vê armanca xwe bicih bînin serhildanên Koçgirî û Pontûsê difetisînin û komkujîyên gelekî mezin dikin.
Piştî ku bi bandora Şoreşa Cotmehê ve hevsengîyên dinyayê diguherin, Îngîlîz, Fransiz û Îtalyan rê didin ku endamên Îttihatê li ser xakeke diyarkirî dewleteke Tirkan ava saz bikin û dawiyê de bi peymana Lozanê ve biryar didin ku dewleteke Tirkan ava bibe.
Bûyerên piştî vê peymanê jixwe aliyê her kesî ve baş tên zanîn. Mijara me 19 Gulanê ye lewre em cardin vegerin li ser wê.

**Û 19 Gulaneke Din**

19 Gulanê salvegera komkujîya gelê Pontusê yî Rum e û wekî rojeke bibîranîna vê komkujîyê hatiye îlankirin. Parlementoya Yewnanîstanê 19 Gulanê wekî "Roja Bibîranîna Qurbanîyên Nijadkujiyê" qebul kiriye.

Yanê 19 Gulanê yî bi aliyê Tirkan ve wekî cejn tê pîrozkirin di nav civaka Yewnan de tê wateya salvegera nijadkujiya Rumên Pontûsê û 19 Gulanê wekî rojeke reş, matemî tê bibîranîn.

**Li Pontusê Çi Qewimîbû?**

Koçberkirina Rumên Pontusê di sala 1914'an de dest pê kiriye. Piştî ku Împaratoriya Osmanîyan di şerên Balkanan de têk çû, Rumên Pontusê jî hatin neçarkirin ku ji welatê xwe bihêlin û biçin. Bahaneya wan jî ew e ku Rumên Pontûsê "hevkariya" Rusan dikin. Vê rabêjê xwe çê dikin, xwe bawer dikin û dawiyê de bona nijadkujiya Rumên Pontusê wekî hincetekî bi kar tînin. Bi rastî koçberîkirin û jenosît bingeha siyaseta Îttihat û Terakkîyê ya wê serdemê ye, jixwe ji heman siyasetê bes ne Rusên Pontusê, Ermenî û Suryanîyan jî para xwe girtiye. Berîya ku fermana koçberîya girseyî tê dayin, çeteyên di bon kontrola kesên wekî Osmanê Topal û Recepê Serserî êrîşkariyê li ser Rumên Pontusê dikin. Zêdepariya mêrên civaka Rumên Pontusê tên neçarkirin ku tevli artêşa Osmaniyê bibin û ev kesana tên neçarkirin ku karên giran de bi salan bixebitin. Lewma jî war û gundên Rumên Pontusê bêparêzî dimînin. Ev yek jî hêsa dike ku çeteyên di bin destê kesên wekî Osmanê Topal û Recepê Serserî êrîşên giran li gundên Ruman ên bêparêzî bikin. Bi sala 1916'an pê de koçberîkirina girseyî a Rumên Pontusê dest pê dike.

Lêkolîner û nivîskar Tamer Çîlîngir di derheqa koçberîkirina sala 1916'an de wiha dinivîse; "sirgûna wekî "sewqiyat" binav dikirin li Deryaya Reş sala 1916'an dawiya meha mijdarê de hate destpêkirin. Bêyî ku wan ên hewara xwe kirin çiyayan, xwe di qulên şkeftan de veşartin hîç kes li cih nema. Çarenûsa ku Partiya Îttihatê bona wan diyar kiribû bes ev nîn bû, dawiya vê sirgûniyê yekser mirin bû. Qaşo li gorî biryara hatibû dayin divê 50 km li aliyê başûr ve biçûna lê hin caran ev dûrahî wekî 200km dirêjtir bû." Dîsa li gorî xebata Çîlîngir li ber arşîvên navneteweyî girtiye di navbera 1914-1922'an de û di koçberîkirinê de bi tevahî 353 hezar Rumên Pontusê tên kuştin.

**Û Qada Dawîn**

Berfanbara sala 1920'an de li heremê bona ku dewleteke serbixwe a Rumên Pontusê bê avakirin serhildanek dest pê dike. Komên Tirkan ên di bin destê Osmanê Topal de tên şandin ku serhildana gelê Pontusê bifetisînin. Serhildana Pontusîyan a dawîn ji sibata sala 1923'yan de tê fetisandin.

Li gorî arşîvên fermî ji girseya tevlî van serhildana 11.188 kes hatin kuştin, nêzikî 10 hezar berxwedêr wekî dîl hate girtin û di Mehkemeyên Îstiklalê de hatin darizandin û yên mayin jî sirgûn tên kirin bona herema "anatolyaya navîn."

Helbet zêr û malên Rumên Pontusê bi aliyê gurdanên Osmanê Topal û Recepê Serserî ve hatin şêlandin.

Gelek jinên Rum wekî dîl hatin girtin. Helbet divê bê gotin ku Osmanê Topal heman komkujî û şêlandin di serhildana Koçgirîyê de jî kiribû û wekî encama van komkujî û şêlandina ev kes bû sermayedarekî mezin.

Piştî sala 1923'an de Peymana Lozanê hate daynin 1.200 000 Rum koçberî Yewnanîstanê bûn. Rumên Pontusê jî nav van koçerban de bûn. Rumên hatibûn sirgûnkirin yek rojê de terka welatê xwe, xan û malên xwe dan, hîç tiştekî xwe hilnedan ji ber ku; fermanê wisa digot. Lê paşê çi qewimî? Rumên Pontusê sirgunî Yewnanîstanê bûn lê hîç zemanî Yewnanîstan wekî welatê xwe qebul nekirin. Li Yewnanîstanê ev kesana tijiyî taxên wekî gettoyan bûn bi aliyê gelê Yewnan ve her tim hatin adinkirin.

Ji vê civatê gelekî kesan xwe avête bextê alkolê.

Bo nimûne li Atînayê taxeka bes ji bona van kesan heye. Li bajarê Atînayê herema Ambolukîpîyê xanîyên van kesan ên wêrane hê jî henin.

Niha ev xaniyan bi aliyê "dagirkerên xaniyan/komên anarşîst" ve hatine veherandin. Meriv dikare hê jî rêça Rumên Pontusê li navendên wekî Atîna, Selanîk û Gîrîtê bişopîne. Bêyî hin bîrhatîyên nivcî û xanîyên wan ên wêrane êdî li şopa Rumên Pontusê zêde tiştek nemaye.

# Pirûka "Li Kurdistanê Hêzeke Nûh/JINÊN KURD" de Jin

Zerya Malamamikê

Rohat Alakom di pêşgotina pirtûkê de dibêje ku; "iro rewşa jinan, maf û azadîyên wan, tevger û têkoşîna jinan li her welatî bûne babêta lêkolînên fireh, bêhejmar berhem tên amade kirin û lêkolîn tên çêkirin, hemû ev karan çawa em dibînin beşeke xebatên zanistî-lêkolînên jin (women's studies) pêk anîne." Berdevamiya van hevokan de meriv fem dike ku birêz Alakom vê xebata xwe jî wekî nûmûneyeke xebat/karên jinan (women's studies) dibîne. Belê bi rastî jî, ne bi tenê jiyan, maf û têkoşîna Jinên Kurd, hemû mijarên di derheqa Kurdan de, zimanê Kurdan xwe û heya dîroka Kurdîstanê jî bi hêviya lêkolîn û nivisînê nin. Lê ji kirinê xweştir tiştek hebe ew jî teqes kirina rast û qenc e. Wekî mînak, di derheqa dîroka Kurdistanê de jî bi hezaran xebatên heya niha hatine kirin henin lê zêdepariya wan bi destê dijminên Kurdan ve û gorî hişmendî û berjewendîyên wan hatine kirin.

Lewma jî her çi qasî bi aliyê tesnîfkirinê ve meriv van xebatan jî wekî "xebatên di derheqa dîroka Kurd/Kurdistanê" bi nav bike jî, wate û pênaseya van xebatan gorî îdeolojî û armanca kesan yekser ferq dike.

Wekî vê her çi qasî gelek xebatên di derheqa jiyan, maf û dîroka tevgera jinan de hebin jî zêdepariya van xebatan bi hişmendîyeka pederşah ve û gorî nirxên pederşahiyê hatine kirin.

### Lê gelo "Li Kurdistanê Hêzeke Nûh/JINÊN KURD ji nav xebatên jinan de çi îfade dike?

Ji çaxên qedîm pê ve mirovan tim zanibû ku hêza/erka binavkirinê rasterast di derheqa pênasînê de ye û desthilatdarîyeka xurt dide xwedîyê navan. Lewre xwedîyê navan gorî hewce yên xwe, hişmendî û berjewendîyên xwe navan belav dike. Li nav xebatên jinan de jî binavkirin û pênaseya jinan a bi aliyê mêran/çanda pederşah ve hatiye kirin cihekî girîng digire. Li çawirdora dinyayê xebat û rexneyên tevgera jinan dike ku, gotîn, îfade û pênaseyên jinan gorî hişmendî û berjewendîyên çanda pederşah pênase dikin îfşa bike û ji dewsa van ên desthilatdariya pederşahiyê bihêztir û domdartir dikin zimanekî nû biafirîne. Ji bona bikaribim mabesta xwe bi awayekî zelaltir rave bikim dixwazim pêşiyê heman mijarê bi nasnameyên Tirktî û Kurdtîyê ve rave bikim. Jixwe di hemû şêweyên desthilatdariyê de rewş kêmzêde wekî hevdu ye. Wekî vê gorî hişmendîya desthilatar a li Tirkiyeyê Kurdbûn kêmasîyek, qusureka mezin e. Lewre Kurd her çi qasî xwe ji taybetmendîyên wekî "kurdbûn" tên nîşandayin rizgar bikin yanê her çi qasî bişibin Tirkan/Tirktiye ew qasî hêjatir, meqbultir dibin.

Bi aliyê desthilatdaran ve tên qebulkirin. Ev yek wiha ye ji ber ku nav û pênasîna Kurdbûnê bi aliyê dijminên Kurdan ve tê daynîn.

Wekî vê ji dîroka nivisî pê ve mêran bi hezaran caran tarîfa "jintîya meqbûl" daye, her dîn, îdeolojî, heya her "serokî" gorî xwe pênaseyên jinbûnê kirine.

Carna ev pênaseyan yekser ji devê pêxember, şêx an jî serokekî wekî qanûn/rêgezekî hatine kirin lê gelek caran jî bi rêya wêje, hûner, muzikê ve bi awayekî "estetîk" jin bi aliyê mêran ve hatine "perwerdekirin" û pênasekirin.

Xebateka bi îddaya tevkarîya kar/xebatên jinan (women's studies) ve tê amadekirin divê hîç

nebe, binavkirin û pênaseyên çanda mêrtîyê bi kar neynin an jî li nav nîşaneka dunikê de bi awayekî rexneyî bi kar bibin.

De ka werin em vegerin li ser pênasîna jinan a di pirtûka birêz Alakom de:

"Şeref xan di şerefnameyê de, vê jina Kurd wek 'jineke **mêrxas** û egid' bi nav dike" (rpl:33)

"Ev xanima Kurd **wek mêran** di rêvebirina kar de xwedî kabîlîyetekî bû" (rpl:34)

"Canfidayî, **mêrxasî** û cengawerîya jinên Kurd wusan ji bala medya cîhanê kişandiye ser xwe" (rpl:74)

"Adîlexanim jineke bi cesaret, zana, **keçebav** û xwedî otorite bûye." (rpl:85)

"….Jineke bi navê Na'a **Nêr mêrxasî** û egîtîke mezin nîşan dide, bi xwe çekçêkir (silahçêkir) bûye, li dijî hêzên Ingîlîliz şer kirîye. Çawa tê zanîn peyva **"nêr" ji bo hebûnên wekî mêran tê bi kar anîn, ew wek mêran bûye**…"

Bi sedan îfade û gotinên mêrane di pirtûkê de cih girtine lê bi dayina bi tenê çar mînakan ve meriv dikare rasterast bibine ku "mêr-xas" peyveka yekser pesna mêrtiyê dide, ji bona jinan tê bi kar anîn. Her desthilatdarî komên ji bin destê xwe de gorî norm/nirxên xwe dinirxîne.

Çawa ku gorî Tirktiyê divê Kurd û welatê Kurdan tim gorî berjewendîyên Tirkan bên nirxandin û Kurdê herî meqbûl jî ew ên xwe dişibînin/dixwezin bişibin Tirktiyê bin wekî vê çanda mêrtiyê jî jinbûna meqbûl gorî berjwendiyên xwe pênase dike.

Gorî çanda mêrtiyê jî jin divê tim di bin kontrola mêrtiyê de bin lê heke kêm caran çend kesên bi awayekî desthilatdarî bi destxistî hebin wan jî wekî "xasên mêran", "kesên dişibin mêran" pênase dikin. Heke jinek bişibe jinan/jintiyê divê newêrek, bindest û belengaz be, ji ber ku jin di bin desthilatdariya mêran de wiha tên pênasekirin û neçar dimînin ku wiha bin. Lê belê carna nav jinan de jî kesên "wekî mêran", "mêrxas" derdikevin!

Wekî vê, gorî çanda mêrtiyê bedena jinan bi tenê ji bona hebûna zarokê malzarok e lê belê nijad/kok ji bêv tê. Lewma jî gava keçikek gorî nirxên civaka pederşah werêk, serxwe, xwebawer be jê re dibên "qîza bavê xwe" yanê dîsa pênaseya jinê li mezinkirina mêr/bav ve pêkan dibe.

Birêz Alakom hemû gotin, pênase û binavkirinên civaka pederşah bê rexne dubare kiriye. Wekî mînak bi tevahiya pirtûkê de zewaca jinan wekî "qîz dayîn, qîz xwastin, ji xwe re wekî jin hildan/birin" tê pênasekirin. Lewre civaka pederşah jinan wekî kes/xwedîyê îradeyê bi nav nake û jixwe zewaca jinan jî bi dest û destûra bav, bira, mam an jî mêrekî desteser ve tê kirin.

Hemû kod, tabû (bestel) û edetên çanda pederşah bi her rave û gotinê ve cardin hatine dûbarekirin.

"Carina jî xortek bi keçekê re hevaltîyê dike, keçanîya wê xirab dike, paşê jî li wê xweyî dernakeve…" (rpl: 27) Wekî bi awayekî eşkere tê dîtin ku ew bestela dibê ku divê jin zayendîtiya ji ser navê "şerefa" mêrên mala "bavê" xwe bi parêze. Heya ku bi destûra mêrên malbata xwe vê kesekî re nezewice divê çu carî hay ji potansîyela xwe ya zayenditî nîn be. Wekî hemû civakên din yên pederşah civaka Kurdan jî li ser navê "keçanîyê" gelek jinan dikûjê, zêdepariya keçikên Kurd bi zaroktiya xwe pê de bi gelek awayan bi "keçanîyê" ve tên tehdît kirin. "Keçanî" wekî qîmetekî herî giranbiha tê parastin ku gava keçik mezintir bû bi aliyê civata pederşah ve wekî "bûkeke meqbûl" bê dîtin.

Gorî nirxên civaka pederşah qîmetê jinan û hurmeta li hemberî wan girêdayî parastina "namûsê" ye. Zayenditî û bedena jinan "namûs" e û xwedîyên namûsê jî mêr in. Mêr ji

bona "namusa xwe" biparêzin tim ditêkoşin. Lê carna, serdemên şer de heke êdî çu carê nîn be ku "namûs" bê parastin îcar jî jinên "mêrxas", "meqbûl" divê bi awayekî xwe ,"bedena xwe" ji ber êrîşên dijmin bifilitînin ku "namusa" mêrên xwe nexin ji bin pîyan.

"Çawa tê xuyan, piraniya jinên Kurd ji bo nekevin destê dijmin, ya xwe xeniqandine, ja jehr xwarine, ya jî xwe jî kelê de avêtine." (rpl:35)

"Gelek keç û jinan jî, tenê ji bo nekevin ber destê dijmin, anîne xwe ji kendalan de avêtine an jî xwe avêtine robar û çeman xeniqîne." (rpl:50)

Di nav civaka pederşah de her tim pesnên jinên ji bona nekevin ji destê dijmin an jî destê mêrekî xwe dikujin tê dayîn. Birêz Alakom jî di gelek cihên vê pirtûkê de pesna xwe kuştina van jinan dide.

Di rûpela 58an de wiha tê gotin; "Anî Xatun xûşka mebûsê Dêrsimê Dîyap Axa bûye, çawa em ji çavkanîkê din fêr dibin ev gilî- gotinên ku derheqa Anî Xatûnê de hatine derxistin, bi zanetî ji aliyê hêzên dewletê de hatine belav kirin,…."

Di heman rûpelê de dîsa tê gotin ku Tirkekî pirtûkeka bi navê "Dersim-37" ve nivise û kiriye ku navê Besê wekî jineke "mêrxapînok" û "bênamûs" derxe.

Helbet nivîskar dîsa rexneya du nirxên çanda mêrane yên wekî "nav derxistin" û "nav belavkirin" ê nake. Me li jorê hinekî qala hişmendiya çanda pederşah ya civatê kiribû, jixwe ev pirtûk jî heman çandê diparêz.

Raveya mijaran jî gorî nirxên çanda pederşah dike lewma jî ji dewsa rexnekirina gotinên wekî "nav derxistin, nav belavkirin, namûs-bênamûs" idda dike ku ev bi tenê îftirayên dijmin in.

Ji bona meriv bikaribe gotina "mêrxapînok" nîqaş bike jî divê merîv dîroka çanda desthilatdar ya mêran bi awayekî hurgilî binêr e. Lê bi kurt û kurmancî meriv dikare bibêje ku ji dîroka desthilatdariya pederşah pê ve hêza jinan ya zayenditî wekî çekeke herî bibandor tê dîtin. Lewma jî potensîyela jinan ya zayenditî bi aliyê zêdepariya olan/dînan, rêxistinên siyasî û leşkeri, qanûnên dewletê ve tê kontrolkirin. Ev yek bûye sedemeke bingehîn ku jinan ji malan de dîl bigrin, derketin û gerrana ji derve qedexe be. Wekî vê beden û kincên jinan jî gelek caran gorî heman hişmendiyê hatiye kontrolkirin. Yanê heya ku hêza binavkirinê ji destê çanda pederşah be, gorî gelek sedeman dikarin jineke wekî "mêrxapînok" pênase bikin.

Bi rastî, heke min biçeribindiya ku qala hemû pênase, gotin, fikrên bi awayekî eşkere kêrî bihêztir û domdarkirina çanda pederşah tên bikira, divê naveroka vê nivisê zêde dirêjbibûya. Lewma jî min xwest ku hîç nebe bi dayina çend mînakên sereke ve, bi kurtasî nîşan bidim ka gelo gorî vê pirtûkê bi îddaya tevkarîya xebatên jinan ve derçûye jin bi çi awayî pênase kirine. Rohat Alakom di tevahiya pirtûkê de bi zimanê civakê ve xeberdaye û her mijarek jî dîsa wekî hişmendiya civaka pederşah rave kiriye. Helbet baş e ku di sala 1995an de mirovekî di derheqa jinen Kurd de him jî bi zimanê Kurdî ve pirtûkek nivisîbe lê belê divê cardin bê gotin ku ji kirinê çêtir kirina rast û qenc e.

Çawa ku em divê pirtûkên bi destê Tirkan ve gorî hişmendiya Tirktiyê li ser Kurdan û Kurdistanê hatine nivisîn bi awayekî rexneyî bixwînin û îfşa bikin, divê heman yek ji bona xebatên bi hişmendiya çanda mêran ve hatine nivisîn ve jî bê kirin. Li Kurdistanê Hêzeke Nûh/JINEN KURD jî yek ji wan xebatanan e ku divê bi aliyê kesên cuda ve bi perspektifeke femînîst ve bê rexnekirin.

# Gelo Pirsgirêka Kurdan an Pirsgirêka Tirkbûnê Heye?

Bênaz Rubina

Piştî ku li Kurdistanê şer ji nû ve lezgîntir bû rojevê jî dîsa gorî şerê berdevam dike şêwe girt. Hin kesan dîsa ew gotinên berê yên berbelav dubare kirin "Jixwe pirsgirêkeke nijadî an jî nasnameyî nîn e, lê pirsgirêka aborî û demokrasîyê heye." Hin kesan jî raveya ku dibê "divê navê pirsgirêke rast be kirin, navê vê pirsgirêke pirsgirêka Kurdan e" dubare kirin. Raveya yekemîn çi qasî eletewşî be raveya duyemîn jî ew qasî şaş e. Ji ber ku pirsgirêka heyî pirsgirêka Kurdan nîn e, pirsgirêka Tirkbûnê ye. Ma Kurdan bi hebûna ve li ser jiyana kê astengî çê kirine ku hebûna Kurdan ji bona hin kesên din bibe sedema pirsgirêkan? Divê navê mijarê rast bê kirin; vê pirsgirêke bi dagirkeriya Tirkan ya li ser vê erdnigarîyê ve destpê kiriye. Erdnigariya ku Kurd lê dijîn berîya dagira Tirkan jî gelek caran hatiye dagirkirin lê belê ji wan dagirên berê tu yekî jî qasî dagira Tirkan werankerî nekiriye. Çikû ji van hêzên dagirker tu yekî nekirîye ku Kurdan ji nav xwe de bişavtîne û hebûna Kurdan înkar bike, înkarkirina Kurdan dîsa li ser Kurdan ferz bike. Jixwe ji bilî van hêmanên nedîtî di dîroka mêtinkariyê de wekî gelekî mêtingeh Kurd û wekî dewleteka mêtinkar jî dewleta Tirkan, mînaka yekemîn e. Ji ber ku di dîrokê de tu gel bi aliyê dagirkeran ve bi darê zorê neçar nemaye ku xwe înkar bike û xwe bi nasnameya desthilatdarê ve pênase bike.
Wekî mînak Fransayê çu gelên kiriye mêtingeha xwe nedaye zorê ku hebûna xwe înkar bikin û xwe wekî parekî nijada Fransiz pênase bikin. Di dîroka netewe-dewletiyê de Îsraîl dewleteke herî nîjadperest e, lê ne Fîlîstîniyan wekî parekî gelê Cihû dibîne, ne dike ku Fîlîstiniyan wiha ji dinyayê bide nasîn û ne jî zorê dide li ser Fîlîstiniyan ku ew xwe wiha bidin nasîn. Dewletên metînkar yên herî kevn, her çi qasî îro heman yekê bi awayekî din bidomînin jî, nawêrin ku hevpariyekî di navbera pajerojê û niha de daynin, ji bona sûcên berê kirine "lêborînê" dixwazin ku bikaribin hevpariya paşerojê û niha veşêrin. Li hemberî vê Tirk yekem civate ku hesreta talan, komkujî, dagirkerîyên xwe yên berî dikşîne, hesretê dikşinê ku li ser xaka dagirkerîyê li ser pişta hespan be. Wekî vê li darê dinyayê de çu dewlet û neteweyeke din nîn ku cihên dagirkirîye wekî "xaka welêt" bibîne û gelên niştecih yên li dijberî dagirkeriyê tevdigerin jî bi "xiyanetkirina welêt" ve sûcdar bike. Wekî ku baş tê zanîn ew Osmanîyên Tirkbûna heyî bi şanazî wekî "kal û bavên" xwe qebûl dike, bi qasî çarsed salan welatê Yewnanan di bin dagirkeriya xwe de girt, di dawiyê de neçar ma ku wê xakê bihelê û biçe. Lê hemberî vê rastiyê dîsa jî Tirkbûn, erdnigariya li nav xaka Yewnanîstanê de ya wekî Trakyaya Rojavayê tê binavkirin wekî welatê xwe dibîne û di wê hesretê de ye ku rojekî bikaribe vegere li wir. Rewşa herî sosret jî ew e ku ji bona dagirkeriya berê li hemberî Yewnanan şermkirin bila aliyê din bisene, ji ser re jî ew Yewnanan wekî dijmin û bêhewa dibînin. Wekî vê yên ku welatê Ermenî, Kurd, Siryanîyan dagir kiriye, ev gel neçarî koçberiyê kirine û yên mayîn jî an bişavtiye an jî hebûna wan înkar kiriye Tirk in. Lê hemberî vê yekê yên ku Ermenî, Kurd û Siryanîyan wekî dijmin dibîne û bi "îxanetkirina welêt" ve tawanbar dike jî dîsa Tirk in. Gelo ev çawa derûniyê ku him zilmê dikin him jî qareqara wan e dibên zilm ji me tê kirin? Wisa tê xuyane ku Tirkbûn bûyereka xweser e, çu mînakên wê nîn in û divê bê lêkolînkirin. Lewre Tirkbûn ne bi nijadperestiya heya niha tê zanîn, ne bi netewperestiya heya niha tê zanîn ne jî bi faşîzma heya niha tê zanîn ve nayê ravekirin. Şertê bingehîn yê nijadperestiya klasîk ew e ku kesên ji nijada xwe nîn bin bên adinkirin. Yanê tu carî çêrmspî reşikekî ji xwe nabîne, heke kesê reşîk bike ku wekî çêrmspî bê dîtin jî çêrmspî vê yekê napejirîne. Wekî vê hêmanên faşîzma klasîk jî wiha nin. Wekî mînak faşîzma Almanan ne xwediyê wê armancê bu ku Cihûyan bike Alman heya armanca wê ew bû ku "Almanbûnê ji Cihûyan veqetîne."
Li darê dinyayê de bi tenê Tirkan kiriye ku hemû kesên li erdnigariya di bin desthilatdariya wan de dijî bi darê zorê bikin Tirk û her ku ev yeka kirine ew qasî xwe wekî bitûn, temam

dîtine. Bi rastî piştî ravekirina hemû van yekan ji me wisa tê ku divê Tirkbûn wekî nexweşîyekî bê qebûlkirin, lê belê wiha nîn e. Heke Tirkbûn nexweşî bûya îcar jî divê muafîyeta Tirkbûnê ya cezayî bihata qebûlkirin û tu hewceya van nîqaşan jî nedima. Tirkbûn nexweşî nîn e, mijareke xweser e û naşibe çu tiştê din. Tirkbûn navê diyardeyeke sondxwariye ku hemû cihên serê şurê Tirkbûnê digihêjê bi zilm û zordariyê bike Tirk û Misilman. Tirkbûn ew e ku hemû kesên Tirk nîn in wekî dijmin dibîne, bi zilm û zordariya xwe pozbilindiyê dike, nafikire û ji vê yekê serbilind dibe, heya ku zilm û zordariyê neke nikare xwe wekî heyî û zindî hêst bike. Belê, îro li hemû cihên ku Tirkbûnê li ser bandor kiriye de pirsgirêk Tirkbûn xwe ye. Pirsgirêka heyî ya li Kurdistanê û Tirkiyê jî pirsgirêka Kurdan nîn e, pirsgirêka Tirkbûnê ye.

### Û Tirkbûn Çi ye?

Wekî tê zanîn em di nivîsên xwe de behsa Tirkbûnê dikin û hemû gotinên herî xerab jî layiqî Tirkbûnê dibînin. Li hemberî nivisên me hin "dostên Kurdan yên Tirk" gilî gazincên xwe dikin. Ew dibêjin ku " Tirk û AKP, MHP heman yek nîn in, em jî Tirk in lewma jî divê hûn hemû Tirkan sûcdar nekin. Ev kiryara we nijadperestî ye!" Em jî dîsa dîsa û bi awayekî zelal rave dikin, û dibêjin ku "Tirkbûn ne nîjad e ne jî çand e. Tirkbûn wekî Nazîsmê, Sîyonîzmê mamûleke îdeolojiyek a xwedî rêgez û prensîp e. Afirînêrên wê jî dewlet e." Dîrokê de qewmên, gelên wekî "Tirkofon" dihatin binavkirin hebûn û ev pênaseyeke îdeolojîk nîn bû. Jixwe hevpariyeke wisa ya di navbera van qewman de nîn bû. Lê belê êdî di navbera Tirkbûna roja îroyin û Tirkbûna berê de hîç hevpariyek be jî tune.

Lewre êdî çu kes li ser sedemên wekî têkiliyên eşîrî an jî xwînî ve wekî Tirk nayê pênasekirin. Em niha di serdemeke wisa de dijîn ku ji demeka nêz de hat îspatkirin ku mirovên vê serdemê genên Neanderhalan niha wekî Homo Saphiens dihewînin, wekî vê bi awayekî gelek asayî dibe ku bi testên DNAyê ve genên Tirkan jî bên tespîtkirin. Heke îro analîza DNA ya Tirkan bê kirin, yê bê dîtin ku xêzantiya Tirk û Uyguran ji ya Tirk û Rum, Kurd, Hitit, Frig û gelên din ên niştecih dê kêmtir e. Li gorî vê ew kesên xwe wekî Tirk pênase dikin divê pêşiyê rave bikin ku gelo li gorî çi xwe wiha pênase dikin. Êdî hevpariyên wekî xwîn, kok, çand helîyane û dûcarî mutasyonê bûne lewma jî sedemên Tirkbûnê û naveroka vê pênaseyê jî guhertiye. Belê Tirkbûn êdî nasnameyeka siyasî û îdeolojîk e. Ev nasnameya xwediyê rêgez û prensîp e ku di aliyê dewletê ve li gorî welatê hevpar, bejewendiyên hewpar, dîroka hevpar ve hatiye avakirin. Tirkbûn nasnameyeka îdeolojîk e ku bingeha wê bi aliyê yek ji avakerê TKPê Ethem Nejad û Ziya Gokalpê tê zanîn ku ji malbateka Kurd e ve hatiye avakirin. Îro êdî rêgezên Tirkbûnê yên neguherbar henin û Tirkbûn hêzeke desthilatdar e. Lewma jî çu raveya wê gotina dibên "ez Tirk im, lê rêgezên Tirkbûnê naparêzim û aligirê Kurdan im" nîn e. Em ne niyeta kesên dibên "eslê min Tirk e" nîqaş dikin ne jî di bin vê gotinê de xerabiyekî diğerin. Xuya ye ku van kesana wateya Tirkbûnê fêm nekiriye. Li gorî van mirovan Tirkbûn nijadek e û ji berê ve heya niha xwediyê domdariyekî ye. Tirbûn wekî rewşeka sirûştî tê dîtin. Lê belê dîrok wekî gotinên di destana Ergenekonê de pêk naye. Pêşhatiyên nifşa mirovan yên wekî Neandarthal û Homo Sapiens henin û eslê hemû mirovan jî bi awayekî digihêje ji van pêşhatiyan. Ji van kokan bi sedan, bi hezaran famîlyayên nû jê zêde bûye û her yek ji van famîlyayan jî komên îdeolojîk yên bi wekî netewe, nijad pêk hatine.

Helbet dibe ku rojekî agahiyeka hemû van yekan biderewîne derkeve holê, lê rewşa heyî ev e, an çîroka Adem û Havva ye an jî ev. Ya herî girîn jî ew e ku Netewe û gel ji berê ve tune nin û berdewamiya wan jî nîn e. Her mirov ji nişfa mirovan ya ji heman cihî hatiye tê. Lewma jî divê pênaseyên wekî Kurdbûn, Tirkbûn an jî Ermenîbûnê ne bi wekî seçere/ koka nijadî bên bikaranîn.

Divê ev pênaseyan li gorî berjewendiyên hevpar, çarenûsa hevapar, jiyana hevpar bên kirin. Jixwe ev jî hêmanên siyasî nin. Li gorî van gotinên xwe cardin rave dikim ku Tirkbûn navê qewmekî, silale an jî etnîsîteyekî nîn e. Tirkbûn nasnameyeke îdeolojîk û siyasî ya ku xwe li ser înkar û tunekirina gelên din avakirî ya xwedî rêgez û armancên wekî "**sêva sorgevez/kızıl elma**" yê ye. Tirkbûn desthilatdar e û xwe bi desthilatdariyê ve domdar dike. Ew kesê ku dibê "ev van yekan naperêz im lê Tirk im" divê sedema Tirkbûna xwe û pênaseya xwe ya Tirkbûnê rave bike.

Lewre wekî em dizanin Tirkbûn ev e, kesên ji van yekan naperêzin jî Tirk nîn in.

# Derbarê Hevpeyvîna Firat Ceweri û Alî Gurdilî de çend gotin...

Rojda Alagyaz

Min îro hevpeyvîneke Firat Cewerî ya bi aliyê Alî Gurdilî ve hatiyekirin xwend. Bi rastî Alî Gurdilî bi karên xwe ve, ziman û şêwaza xwe ya pak û delal ve her tim bala min dikişine. Ez bloga wî (Gurdili.blogspot.com) bi kêfxweşî dixwînim. Bona vê hevpeyvînê jî spasdariya xwe ji birêz Gurdilî re pêşkêş dikim. Bi saya serê wan hevpeyvînan em jî fikr û ramanên nivîskarên bi Kurdî dinvîsin dihesin. Ez dixwazim di derheqa gotinên Firat Cewerî de çend fikrên xwe bibêjim ku gotinên wî di derheqa pirtûkên bi Kurdî tên nivîsin û hişmendiya gelemperîya nifşên salên 60î, 70yî de delîlên baş didin.

Birêz Gurdilî dipirse: "Tu di hevpeyvîneke xwe de, wiha radigihînî ku di salên xwe yên xortaniyê de di bin felsefeya Marksîzmê de mayî.

(1) Felsefeya Marksîzmê, bandûreke çawa li cenabê te kir û a niha jî, cenabê te ji wê felsefeyê pêbawer e, yan ramanên te hatine guherîn?"

Û bersîva Firat Cewerî:

"...*Gava ez ji salên naşîtiyê ber bi xortaniyê ve hilkişiyam, bala min çû ser siyasetê û hew min dît ku ez ji dîn bi dûr dikevim û dikevim nav fikir û ramanin din. Ew jî ilmê Marksîzmê bû. Em bi dû meraqê ketibûn û wê meraqê em ber bi deryayeke bêbinî ve dikişand.*

*Em bi rojan li ser bûyer û encamekê dipeyivîn û me bi şiroveyên xwe dixwest felsefeyê ji hev veçirînin. Lê dema ku min dît îdeolojî serdestiyê li felsefeyê dike û em ji pluralîzmê ber bi yekrengîtiyê ve diçin û doza dîktaroriya proleterya di serê me de bi cih dibe û ji aliyê din ve ez ketime nav cîhana edebiyatê, ez ji wê felsefeyê, ya rastî, ji wê îdeolojiyê sar bûm.*

*Di edebiyatê de demokrasî hebe, îdeolojiya ku armanca wê avakirina sîstemeke yekpartîtî be, dûrî demokrasiyê ye. Loma, min hê di bîstsaliya xwe de xatir ji wê îdeolojiyê xwest, min xortaniya xwe li kuçe û kolanên bajarê xwe hişt û ez bi dû evîna zimanê xwe ketim.*"

Çend rojan berê hevpeyvîneke Orhan Miroxlî bi tesadufî ji ber çavê min ket û min wê deme ecêwa reş a giran ferq kir ku Miroxlî û Cewherî derbarê vê mijarê de heman tiştan dibêjin. Lê helbet ev cara yekemîn nîn bu ku min şiroveyên ev qasî qels ên derheqa marksîzm û çepgerîyê de ji nifşa berê diphîst, heya min ev gotinan belkî bi dehan caran ji kesên ku wan salên zor û zehmet de mezin bûne û ketine ji nav kar û xebatên siyasî, kulturî bihîstiye. Belê Orhan Mîroxlî jî digot ez ji malbateka oldar dihatim lê dema ku min dest bi zanîngehê kir ez ketim di bin bandora siyasetê û bi awayekî hesayî bûm neferekî fikra marksîst. Lê Mîroxlî li gorî Cewerî duristir e ji ber ku hîç nebe camêr dibê ku me wê demê nizanibû marksîzm çi ye, esasên wê çi nin. Bes me bihîstibû ku li Sovyetîstanê hemû mijarên çînî û neteweyî "bi awayekî baş" hatine çareserkirin. Loma me jî dixwast em ji heman pergalê sûd bigirin. Yanê zêdepariya van kesên ji vê nifşê di derheqa markîzmê de tiştekî nizane. Dema ew qala marksîzmê dikin mabesta wan yekser stalînîzm e. Heke ev mirovana bibêjin ku em ji çîneke bindest, ji neteweyeka bê dewlet dihatin û êşên me em heya li ber derîyê marksîzmê birin lê belê paşê dema ku me ji bona xwe cih û warên din dîtin, me bi awayekî sirûştî dev ji van îdeolojiyan berdan ez ê bi rastî jî fêm bikim û ji van gotina wan re rêzbigirim. Lê dema ku kêmasiyên xwe bi wekî nanokikên marksîzmê rave dikin îcar pirsgirêk derdikeve ji holê. Jixwe birêz Cewerî pêşîyê divê "armanca

sîstemê wê avakirina yekpartîtî be" yanê bi vê gotina xwe ve eyan dike ku hemû zanîna wî ya di derheqa marksîzmê de stalînîzma sovyetê ye. Ma efendî, bibêje ku min bûyerên sovyetê dîtin ez vî karî qehirîm em ê jî fêm bikin. Lê gelo çima kêmasiya xwe bi wekî nanokiya marksîzmê nîşan didî? Ez bi rastî jî meraq dikim bê ka haya Firat Cewerî ji wêjeya marksîst û dîroka marksîzmê heye an na? Ji ber ku merivekî heke hîç pirtûkên bingehîn ên marksîzmê nexwendibin jî haya wî/wê ji wêjeya marksîst hebe nikare gotinên wiha bike.

Bi kurt û kurmancî, bi qewla Firat Cewerî ve "îlmê marksîzmê" mijareke din, sîstema li Sovyetê mijareke din e. Divê ew kesê xwe bi wekî "rewşenbîr" bi nav dikin pêşîyê bikaribin mijaran rast tesnîf bikin û rexneyên xwe jî li gorî vê rave bikin. Yanê bona ku rejima stalînîst tehdeyeka mezin da li ser nivîskarên cuda difirikin meriv divê îdeolojîyekî kûr û gewre bi çend gotinên subjektîv ve reş neke.

**Ali Gurdilî** dipirse: *"Tu dibêjî; divê edebiyat ji hemû xerabî û kirêtiyan dûr, li ser bingehê humanîzmê bilind bibe. Li gor bîr û baweriya cenabê te, bingehên humanîzma ku cenabê te aniyê zimên, çi ne û wateya ji xerabî û kirêtiyan dûrketin, çi ye?"*

**Firat Cewerî**: "Edebiyat ne wek siyasetê ye; armanca siyasetvan bidestxistina kursiya karînê be, ya nivîskar mesafeya jê ye. Rast e ku hem navenda siyasetê hem jî ya edebiyatê mirov in, lê yek mirovan bera ber hev dide, dibe sebeba şeran, ya din, bi cebirandina ruhên mirovên ku bûne qurbana şeran ve mijûl e. Qenc an xerab, biheq an neheq, ma ne hemû şer ji ber siyasetê ne û siyasetvan li dar dixin?"

Bi bersîva Firat Cewerî ve meriv baş fêm dike ku birêz Cewerî ev karana hê ji sêrî de gelekî şaş fêm kirine. Ya ku mirovan berî hevdu dide, dibe sedema şer û pêvçûnan siyaset nîn e. Berjewendiyên mirovan, sînordarbûna çavkaniyên dinyayê, çavbirçîtî û şerê parvekirina desthilatdariyê ye. Berîya sermayedariyê jî li ser rûyê dinyayê şer û pevçûn hebûn piştî ku mirovan sîstemên bi wekî gund-bajar (bazaar/marketing) ava kirin û sermayedariya taybet jî derket li holê îcar siyaset jî pêk hat. Bona ku hin kes sermayedarî û desthilardariya xwe saz bikin û yên didin jî ji vê yekê razî bikin divê pêşiyê di navbera xwe û yên din/yên bindest de têkiliyêkî jî saz bikin.
Veca navê vê têkiliyê jî siyaset e. Lê ji bîr nekin ku yên bindest jî ji nav vê têkiliyê da nin yanê ew jî "siyaseta xwe" dikin.
Yanê divê meriv navê her tiştî rast dayne, ma sedema şer û pevçûnan siyaset e an sermayedarî û desthilatdarîya zayendperestî, sermayedarî, neteweperestî ye?
Her çîn, netewe, zayend, şêwaza desthilatdariyê li gorî îdeolojîya xwe sîyasetê digerîne û wekî baş tê zanîn edebiyat ji berê ve alafeke siyasetê ya sereke ye.
Heya ku fikr û raman, îdeolojî bi rêya edebiyatê ve neyê vegotin û berbelavkirin kes nikare siyaseta wê fikr û ramanê jî bigerine. Bo nimûnê piştî ku Îttîhat û Terrakîya Jon Tirkan netewe-dewleta Tirkan ava kirin bona ku îdeolojîya Tirkbûnê bicih bikin û desthilatdariya xwe li ser gel bihêz û domdar bikin edebiyat bi awayekî serketî bikar anîn.
Dema ku meriv ji pirtûkên Namîk Kemal, Omer Seyfettîn, Halîde Edip Adîvar, Yakup Kadrî Karaosmanoxlî dixwîne baş tê dîtin ku her çi qasî navbera wan de derheqa mijarên wekî ol, çand û têgihîna nirxên civakî de cudawazî hebin jî hemûyan îdeolojîya Tirkbûnê bi rêya edebîyatê ve bicih kirine.
Dewleta komara Tirkan hê jî bo ku îdeolojîya Tirkbûnê bide qebul kirin û Kurdan asimîmile bike van pirtûkan dide xwendin. Wekî tê zanîn li Ewropayê her sal xelatên wêjeyî didin li nivîskarên bona "nirxên Ewropî û pêşketinxwaz" kar kirine.
Hemû ev rastîyên eşkere bila bi aliyêkî din bisekînin; gava nivîskarek dibêje ku siyaset xerab e û edebîyat baş e û divê herdu ji hevdu cuda bin, yekser rolê edebîyatê jî li ser tevahiya jiyanê binecil dike û edebîyatê wekî meşqaleyeke demderbaskirinê dibîne.
A rast ew e ku ne edebîyat, ne siyaset an jî jiyan bes reş an jî spî nîn e.
Başî û xerabî ji nav hevdu de, gelek caran bi dilqên hevdu de nin. Lewma meriv li gorî îdeolojîya xwe dikare siyasetê jî edebîyatê jî bi gelek awayên cudawaz bikar bîne.
Di berdevamiya bersîva xwe de birêz Cewerî dibê ku "*Di edebiyatê şer tuneye, divê tunebe.*

*Loma, ez dibêjim; di edebiyatê de humanîzîm heye. Heke di siyasetê de xerabî, kirêtî, komplo, xapandin, neyartî û şer hebe; di edebiyatê de mervantî, hevaltî, spehîtî, humanîzm û aştî heye; divê hebe…"*

Divê meriv rast e rast ji birêz Ceweri bipirse; ma edebiyat tantêla cihêzê bûkan e? Yanê jiyan bi xwe li ser nakokiyan, pevçûnan, lihevnekirinan pêk hatiye. Ma gelo çima divê edebiyatê de şer tune be? Bêyî vê yekê jî şer henin li hemberî neheqî, tundî, mêtinkarî, dagirkerîyan tên kirin û divê bên kirin. Belê hin şer jî henin li ser navê humanîzmê, demokrasîyê, azadiyê li hemberî mirovan, bindestan û koleyan tên kirin. Meriv gelo çawa, li gorî kîjan sedeman dikare "hemû şeran" şermezar bike? Veca çima divê di edebiyatê de şer tune be? Ma edebiyat aîdî vê dinyayê nîn e?
Çawa ku siyaset çi baş çi jî xerab hemû taybetmendiyên dinyayê di xwe de bihewîne edebiyat jî wisa ye. Meriv çu carî nikare bibêje ku di siyasetê de xerabî, komplo, kirêtî, xapandin lê di edebiyatê de mervantî, hevaltî, spehîtî, humanîzm, aştî heye an jî divê hebe. Di jiyanê de çi hebe her ew naveroka siyaset, edebiyat, muzik, sinema ye. Meriv bixwaze jî nexweze jî ev wiha ye. Yan na tu dikarî bibêjî ez ê romana xwe bi wekî tantêleka bedew bihûnim ku bes bila naveroka wê de "tiştên baş" –ku baştiya van yekan jî sukjektîv e- hebe lê meriv nikarê bibêje ku edebiyat ev e an jî divê edebiyat wiha be.

Em bi gotinên birêz Ceweri fêm dikin ku wî jî bi wekî zêdepariya mirovan gelek têgih bi rastî jî şaş fêm kirine. Wekî nimûne birêz Ceweri pesna "mervantî, humanizm û demokrasîyê" dide. Lê belê her yek ji van têgihan divê bi awayekî piralî bên nirxandin. Yanê mervantî, humanîzm û demokrasî têgihên pîr û pak nîn in. Wateya her yek van têgihan li gorî cih, babet û zemên diguhere. Demokrasî bes şêwazeke rêvebirinê ye, dibe ku baş an jî xerab bê bi kar anîn.
Bi wekî mînak Hollanda dewleteka herî demokratîktirîn e. Demokrasîya Hollandayê li çawirdora dinyayê bi wekî mînakeke serkeftî tê nîşandayin lê belê Hollanda di heman demê de dewleteka mêtinkar e û dewlemendiya xwe li ser ked û xwîna kolonîyên xwe ava kirîye. Yanê ku hebûna demokrasîyê ya ji nav sînorên Hollandayê hemû pirsgirêk çareser nekirine bes jiyana hemwelatiyên vê dewletê baştir kiriye ev e.

**Lê gelo humanîzm çi ye?**

Komela humanîzmê ya Amerîkayê wiha bersîv daye: Humanîzm şêwazeke jiyînê ya ku pêşverû ye. A ku humanîzm diparêz e ew e ku şiyan û peywîra mirovan a ku jiyaneke çêtir ava bikin heye.
Belê li hemberî xwedê an jî xwedêyan, hêzên îlahî divê şiyana mirovan bê parastin. Lê belê li hemberî heywan/ajalên din meriv çawa bikaribe îdeolojîyeke ku mirovbûnê bi wekî esasa xwe ya bingehîn dibîne biparêz e? Mirovahî, lê kîjan mirovahî?
Mirovahiyeke yekpare nîn e, berjewendiyên mirovan dijberî hevdu nin. Îro mirov li gorî çîn, zayend, netewe, rengê çêrm ji hevdu cuda bûne û di navbera her yek komê de jî nakokîyên berjewendîyan henin.
Bo nimûne îro neteweyên çêrmspî ên Ewropî desthilatdariya hemû dinyayê dikin, him bi aborî him jî çandî-kulturî mêtinkariya gelek civakên cuda cuda dikin.
Wekî vê îro çanda bavsalar li ser jinan û hemû nasnameyên din ên zayendî desthilatdariyê dikin, çanda mêrane a destdirêjiyê her roj bi hezaran jinan dikuje. Gelo çawa meriv bikaribe kujer û maktul bes ji bona mirovbûnê bi wekî hevdu qebul bike? Desthilatdar gelekî ji "humanîzmê" hez dikin ji ber ku humanîzm baş bi kêr tê ku nakokiyen civatê de binecil bikin.
Bi saya humanîzmê bi hêsayî dibêjin ku "belê hemû mirov biqîmet û wekhev in" ku desthilatdarî û destketiyên xwe veşêrin, lê êdî her kes dizane ku "belê her mirov wekhev e, lê hin mirov wekhevtir in."
Bi kurt û kurmancî li hemberî mirovan hîç wateya humanîzmê nîn e.
Li hemberî zindîyên din jî divê jixwe meriv humanîst nebe ji ber ku hemû zindîyên din di bin zilm û zordarîya mirovan de ye.
Helbet mirovên kurdînûs kêm in û dema ku kesek pirtûkan bi kurdî dinvîse em bi vê hewla wî/wê re rêz digirin û bi taybetî bala xwe didin gotin û nivîsên wî/wê. Lê belê bi heman sedeman em dixwazin ku ji nav van kêmaniyê de yên heyî jî karên baş, hêja, cidî bikin.
Em nabêjin ku bes bila kurmancî be çi dibe bila be. Hişmendî, fikr û ramana tê parastin û berbelavkirin jî herî kêm bi qasî zimên girîng e.